

Analîz # Kultur # Lîteratur

HELWEST

Kovara Kulturî û Lîteraturî

ZÎNDANA AMEDÊ

B
E
R
X
W
E
D
A
N
A
1
9
8
4
A
N



K
U
Ş
T
I
N
A
N.
B
U
Y
U
K
K
A
Y
A

DI ZÎNDANÊ DE KARÛBARÊ REWŞENBİRÎ

HELWEST
Kovara Kulturî û Lîteraturî

Utgivare
Moderna Kultur Förlaget

Xwedî
Weşanên Çanda Nûjen

Ansvârîg / Berpirsiyar
Birêvebirê Kovarê
Lokman Polat

Hejmar : 9

Sal : 3 - Zivistan - 1998

Çap : Baran Tryckerî
Stockholm

Abonetî : Salek - 200 Kr.

Derveyê Swêdê : 50 §

Postgîro : 9 13 31 - 9

ISSN - 1400 - 9404

Navnişan / Adres
Tensta Alle 43 - 2tr.
163 64 Spanga - Sweden

Internet E - Maîl
Sertac - hotmail.com

Wêneya Bergê
Jina ku işkence dibîne



Lokman Polat

PÊŞKÊŞÎ

Xwendevanê Hêja!

Me şiklê kovara Helwestê guhart. Ji hejmara 9'an pêve dê hendî kovar bi vê şiklî derkeve. Ev şiklê kovarê ji alî mesrefa posteyê ve baş e, bi erzanî dibe mal. Me ji bo hejmarek kovara Hel-

westê 28 Kron heqê posteyê didan, niha em dê 13 Kron bidin. Heqê çapê -Matbaa- jî ji berê erzantir e.

Di nava Kurdan de bazara weşanên Kurdî qels e, weşanên xwerû bi Kurdî gelek hindik têne firotin. Yênu ku weşanên Kurdî derdixin hemû jî zirar dikin, lê ji ber vatêniya welatperweriyê vê karê bi zirar wek xizmetek dipejirînin û weşanvaniya Kurdî didomînin.

Me heta niha qet nivîsên teorîk yên siyâsî di kovara Helwestê de neweşand. Lê ji niha pêve em dixwazin hinek nivîsên li ser pirsa kultura demokrasiyê biweşînin. Di nav Kurdan de kultura demokrasiyê pîrr qels e. Ji bo lîteratura kultura demokrasiyê di nav Kurdan de pêş bikeve em dê gelek nivîs - lêkolîn û meqale- biweşînin. Yênu ku li ser kultura demokrasiyê dixwazin dîtinên xwe pêşkêşê civata Kurd bikin, yênu ku bi dil û can dixwazin kultura demokrasiyê di nav Kurdan de pêşbikeve bila ji kovara Helwestê re nivîs binivîsin. Di hejmara bê de (hejmar 10) em dê giranî bidin nivîsên li ser kultura demokrasiyê. Di vê hejmare de me giranî daye ser "di zindanê de karûbarê kulturî, rewşenbirî". Me hinek pirtûkên ku li ser zîndanê ne, daye danasîn. Pirtûkên ku li ser zindana Amedê hatine nivîsîn balkêş in. Lê ev pirtûk têr nakin, divê romana zîndana Amedê jî bê nivîsîn. Di nav nivîskarêne Kurda de nivîsîna romanê bi Kurdî dest pê kiriye. Bi hêviya ku romannivîseriya Kurdî hîn jî pêş bikeve.

Hetanî hejmara bê hûn bimînin di xweşiyê de.

— LI KURDISTANÊ PÎROZBAHÎYA SERSALÊ —

Xidirê Ûso

Êvara sersalê herkes li gorî karinîya xwe tevdîra xwe dike: Xwarin, fêkî û şeranîyên xwe amade dîkin. Li her mal, gund û bajarî heval û hogir, lêzim û zeyî li hev vedihewin; bi saz û sazande, bi dengbêj û stran, bi lîstik, şano û hirboqî, bi skeç (kenok), bi zalve, texlît û qerfan sersala xwe pîroz dîkin.

Li her şenîyê Kurdistanê, xortên jêhatî, şep û bi-huner xwe didin hev, dest bi amadeyî û provayêن şano û dîyalogên pêşandana pîrozbahîya sersalê dîkin. Sersal ji bo herkesî rojek teybetî û xwedîyê wateyek girîng e. Divê li gorî nîrxê wê, herkes rola xwe bilîze û berpirsîyarîya xwe pêk bîne. Loma berpirsîyarîya xortan bi hunerên xwe şakirina civakê ye, ya civakê ji, bi pere û xwarinên xweş, razîkirina xorta ye.

Di komika şano û pêşandanê de xortek rola Pîrê Salê, yek ya Kose (Qirdik), yek ya Bûkê û yê din ji rola Zavê digirin. Ev kom, dibe ku bi Fîguranên lîstik û dîlanê, bi sazbend, bilûrvan an erbanevan dewlemendit bibe.

Pîrê Salê, hinek Kalê Xizir temsîl dike, hinekî ji dişibihe Kalê Noel (Father Chrîstmas)'ê fileha. Xortî vî rolî dileyize, ji hiriya sipî rîh û simbêlê xwe çêdike, kum û kolos an cemedanekî li dora serê xwe digerîne, gopalekî dike destê xwe. Ew tenê ne sala derbasbûyî, tevaya dîroka civakê temsîl dike. Wî roj û demsalên baş û xerab buhartîye. Wî azadî û dîlîti, şer û aşitî, xela û dewlemendî, xweşî û nexweşî, başî û xerabîya dinyayê dîtîye. Ew xwedîyê zanîna kevneşopî,

bawerî û çanda civakê ye. Zana, pîspor, aqilmend û jîrikê gel e. Aştîxwaz, dilnerm û şîretkarê gel e. Li hember xwînmij û zordestan, zâlim û neyarêñ êrîşkar ji, parêzgerekî bi hêrs û biryar e. Perwerdekarê zaro û neviya, piştgirê jin û qelsa ne. Rola wî ya di şanoyê de, bi vê giranî û berpirsîyarîye ye.



Kose, li hinek deran ji jê re Qirdik tê gotin: lê di terîmîlojîya civaka Kurd de, ev du kesayetîyên ji hev cuda û dijê hev in. Kose, mizawirî, konetî, fenekî û zexelîyê temsîl dike, lê Qirdik, kawikî, qerfokî, qeşmerî û kenokîyê temsîl dike. Xortê ku xwe dike kose, bê rîh û simbêl e; ruyê xwe serapeng bi tenîya sêlê reş dike, kumekî dide serê xwe. Ew demsala zivistanê, ba û bahoz û tarîyê, nexweşî û xerabîyê, xayîntî, fesadî, derew û fetbazîyê temsîl dike. Di birçîbûn û xizanîyê, di şer û tevkûjiyan, di hemû qeda û belan û karesatêñ xweza û civakê de rola wî heye. Rolê qeşmerî, hoqebazî, texlît û pêkenînan ji dide ser xwe.

Xortek bi cilê bûkanîyê xwe dixemilîne û xêlîyekê davê ser serê xwe. Xortek jî cilên zavetîyê li xwe dike. Bûk û Zave jî, sala nû, biharê, bereket û adanî, kêt û şahî, dewlemendî, aşitî û tenduristî, bedewî û delalîyê, dar û beran, roj, hevv û stêran, hêvî, tekoşîn û serkeftin, tovê jiyanâ civakê, azadî û serxwebûna gel, Kurd û Kurdistanê temsîl dikin.

Komika hunermendant ku xwe amade dikin, êvara sersalê dest bi gera malan dikin. pêşî Pîrê Salê li derî dixe û bi keremkirina xwedîyê malê re derbasî hundir dibin. Piştî silav û êvarbaşiyê, Pîrê Salê, niyaza xwe û hevalên xwe pêşkêşî xwedîyê malê dike:



— Serê salê, binê salê, xwedê zarokê bide vê malê! Piştî tev bi hevre ji ferdên malê re dibên:
— Êvara we xweş, sersala we pîroz be!

Malxwê û kevanîya malê jî, bi dilgermî û dilgesî li wan vedigerîne:

— Gelek berxwedar bin; hûn di ser ser û çavan re, bi xêr û xweşî hatin; sersala we jî pîroz be û hûn gelek sersalan bibînin!

Wê gavê ferdên malê bi rûkenî û dilpakî li wan temaşe dike. Pîrê Salê dertê pêş, bi herdu destan bi ser gopalê xwe ve xûz dibe û xwe dide nasîn:

— Ez dîrok im, serkan im; bapîr im. Min buhart gelek dem û dewran, sal û demsal. Min dîtin buharêngîn, zivistanê reş û tarî! Bi şîrqînêngîn brûskan, bi gurmînêngîn ewran re li min da ba û bahoz, berf û baran! Min xweşî dît û nexweşîyên giran! Geh bûm seyidvan, geh cotoyar û şivan, geh ez bûm cengawer û şervan! Sha bûm ez, bi xêr û bêr, gul û gîha, bi zaro û nevîya! Carcaran xemgîn bûm, bi hatina karesat û bela, xela û xizanîya dînyayê! Ya dijwar jî, min dîtin gelek talan û êrîş,

êrişen teyr û teba, keftar û guran, gurên hov, gurên devbixwîn; êrişen artêsan, êrişen barbaran: Talan kirin, şewitandin, hilweşandin gund û bajar; qir kirin jin û mîr, nefî kirin êl û eyal, seranser wêran kirin Kurdistan!

Pîrê Salê bi xembarî serê xwe ditewîne û dihejîne. Kose dertê pêş û xwe dide nasîn:

— Ez kose me, rûreş û diltarî me. Ez melkemotê mirinê, qeda û bela, xem û nexweşîyê dibarînim; ez zivistanim, ba û bahozan radikim, ewrên reşûtarî dadixim, brûskan dişîrqînim! Xizanî û xela me, birçîbûn û bela me! Ez neyaram; hevalneyaram; xweperest û dilhiş, famkor û fetbaz im; bêbîr û bal, fesad û bekoewan im!

Piştî axaftinê Kose, mîna aqilsivika, bêşerm û bi rûreşî zûzû li dora xwe dinêre û bi dengekî tîz (zirav) dikene. Wê gavê Zave dertê pêş, xwe dinasîne:

— Ez pêşeroj im; civak û gel im; karker û gundi, şivan û gavan im. Kedkar û berhemkar im; serdar û yar im; kelemê pêşçavê neyar im. Lê çi bikim, iro mame xizan, dîl, perîşan û nezan! Evîndarê yara xwe me, xwedîyê viyanêngîn germ, hêvîdarê dâhatuya xwe me! Lewma tekoşer û xebatkar im, Kurd im, dozkar û sozdarê Kurdistan im!

Piştî ku zave axaftina xwe diqedîne, Bûk dertê pêş û dipekiye:

— Ez bihar im; gul û gulîstan, tov û jiyan im. Nişîman im; mîrg û kanî, deşt û zozan im. Çand û huner im ez, ziman û stran, deng û awaz im; bilûr, govend û dîlan im. Evîndar û dildar im; herdem xêr û bêr, aşitî û azadî dixwaz im; bûka salê dayika we Kurdistan im.

Piştî ku qahremanêngîn me xwe didin nasîn, dest bi şanoya xwe dikin. Mijarêngîn şanoyê bi piranî li ser bûyerêngîn balkêş ku di nav civakê de diqewimin. Ev bûyerena bi piranî “trajî - komîk” in: Hinek li ser zîlm û zordarîya polîs û leşkerêngîn dewletê ne, hin li ser bûyerêngîn navbêna jin û mîran, hin li ser evîndarîyê ne. Zalve û texlîtê meş û axaftina mirovan, an texlîtê dengê teyr û teban dikin. Qerf û henekan dikin; serpêhatîyêngîn balkêş yên bi tomet, ecêp û bi pêkenîn dibên. Bi stran û dîlan, bi qeşmerî û hokebazîyan dawîya pêşandana xwe tînin. Gava ku xatirxwestin û şevbaşîya malê dikin, malxwê û kevanî, li gorî karinîya xwe pere, fêkî, xwarin û vexwarin, zad an şêranî dide wan. Ew jî berê xwe didin malek din.

HER TIŞTÊ ME QEDEXE BÛ

Seracettîn Kirici

Girtîgeh
Sîrgûn
Kûştin
Çek
Neheqî
Kûştina "qesas nedîyar"

Penaberî
Serê çekdarî
Îşkence
çiya û zozan qedera me Kurda ye. Îş û elema min -me dîtiye, êşa gundiyyên koçer, êşa siyasetvanê Kurd, êşa xortêni li serê çiyê, êşa rewşenbîr û penaberêni Kurd e. Roj hatiye, em hemî:
Girtîyen di girtîgehan de

Şervanê azadiyê li serê çiyan
Rewşenbîr di qada çandî û hunerî de
Siyasetvan di pêşengiya gelê xwe de
Penaber di warêni dîplomasî de (cih û warêni me cihê cihê bin ji) divê her kes di warê xwe de têkoşîn bide û dilê me hemûyan ji bo berjewendîya welatê me bavêje.

Di hucra tarî de, ez û xeyalêni xwe tenê ne û xeyalêni min ên girtîgeha Amedê wek roja ewili zindî ne. Serpêhatiyêni min ên girtîgeha Amedê yet bi yet di ber çavêni min re derbas bûn.

Ziman qedexe
Fikrandin qedexe bû.
Xwarin, vexwarin, nivîsandin, xwendin, parastin, siyaset, kîf û şahî, hevdîtina dê û bavan, xuşk û birayan, xeyala delalê û zarokan her tişt, her tiştê me qedexe bû. Axîna hevrîyêni min, axîna hogiran, axîna qîz û xortêni Kurd di guhê min de diçinge û di vê çingêniyê de dengek ji dur ve ban

min dike. Gelo çîma, hûn jan û jiyana me ya girtîgeha Amedê bi zimanê me nanivîsinin, çîma hûn vatiniyêni xwe pêk nênin? Ewê roj bê em ê bi bestika we bigrin û hesab ji we bipirsin.

(.....)

Di hucra xwe de, ez tikîtenê bûm. Hucrêni Enquerê ne wek hucrêni Amed û Ruhayê bûn. Piştî lêdan, xeberdan û neheqîyan, wextê min birin hucrê ez gelek westiyâyî û birçî bûm. Di qozîya hucrê de, li ser banqê rûniştîm. Serê min di nava herdu kefîn destê min de û xeyalêni min didomin: Hey lo lo!

Piştî işkencêni Ruhayê; piştî girtîgeha Amedê û Ceyhanê, piştî çend salan ez dîsa li vir im. Di destpêka şoresserîya me de; em, bi hezaran, bi deh hezaran bûn. Ji wan aniha di nav têkoşîna netewî û şoresserîyê de kî maye?

Hin heval hatin kûştin
Hin heval ji pêwîstîya jîyanê penaber bûn.
Hinekan dev ji têkoşînê berdan. Li hember hemî zahmetî, zilm û zordariyê gelek kesan ji di nav refîn têkoşînê de ciyê xwe parastine û li gorî bîr û bawerîyêni xwe xebata xwe didominin. Serê min hîn di nav kefîn destêni min de ye. Peyva Esat Oktay Yildiran "Girtîgeha Diyarbekir ne girtîgeha, Akademîya 5 a ye" ci Akademî bû(!)

Lêdan
Mişk xwarin
Tade
xwe şewitandin
Rojîya mirinê

Kuştin
Nijadperestî
Bêhêvîtî

Ü evîna welat. Ci rojên tijî bûn. Rojên bi êş. Rojên radestî. Rojên berxwedanê, rojên îxanetê, axîna girtîyan. Ci Akademî bû(!) Fêrgeha zilm û zordariyê. Têkiliyên hevrîyan, têkiliyên dostan, têkiliyên rêxistin û partiyên din. Hemî bûyer wek şerîtek filimî di ber çavêن min re derbas bûn. Di meha Tirmehê de, di germa Amedê de rojên meyî bêav, rojên bi qedehek av derbasdibûn, hevalên ji tîna dixewirîn û hevalên ji ber zehmetî û zorbûna jîyanê ji xwe re û ji şoreşgeran re xeber didan. Hemî serpêhatiyên min di ber çavêن min re derbas dibûn.

Ci rojên xerab

Ci rojên bêrûmet bûn... Wek gavek berê wextê me xistin hundur, wek bav û kalên xwe xwestin bi şexsiyeta min-me bilizin. Ü têkiliya rêxistinî bifelişînin...

Di girtîgeha Amedê de bi rojan nan û av nedidan me, piştî wê ji bi aperloyan û bi tekiliya qerdiyanan ban me dikirin û digotin: "Yên dixwazin alikariya dewletê bikin bila derkevin derive. Mana vê hevokê "îspîyoncîti" û sîxuriya hevalan bû. Ji nav girtîyen Amedê, bi sedan sîxur derketin. Pir mirovîn hêja, pir şêr û pilingên li derive di vê pêvajoyê de bêdeng man. Me ji şexsiyeta xwe gelek tişt wendakir.

Bi fermî me radestîya dewletê û rûreşî bêhemdî pejîrand. Biryar û zagonên 12'ê Ilonê wek jîyanâ dervê me ji radest girtibû. Pir caran em heta sibê şiyar diman. deng û nalîna hevalan wek xencerek li kezeba me diket. Lê em bêdeng diman... Hîn û hîn dengê axîn û nalîna girtîyan di guhê min de ye.

Girtîgeha Amedê

Girtîgeha Evinê (Îran -NH)

Girtîgeha Uruguay

Girtîgeha Şîlî

Girtîgeha Afrîqa Başûr û girtîgeha Saygonê derbas kir. Bi hezaran welatparêz, şoreşger demek dirêj dibin nîrê raydarêن zilimkar de rojên xerab û tije işkence derbaskirin. Jîyanâ mirovîn girtîgeha Amedê ji bo mirovatîyê ji bo dinê rûreşîyek mezin bû.

Generalên darbeker, generalên faşîst bi deh hezaran mirov, bi sedan komel, sendîqa, partî û mûxalefeta gel bê deng hêstibûn. Tu rêxistin, partî û hêzên pêşverû li hember darbê derneketin.

Cih cih hin reaksiyonê biçûk hebûn lê têr nedîkir. Tu kesî li hember darbê hêzên xwe nekirin yet û berxwedanek bi rêk û pêk nîşan nedan.

Rayedarên dewletê ji derbasbûya xwe zanibûn ku bingeha şoreşê bingeha demokrasiyê ye û bingeha têkoşînê di girtîgehan de tê avêtin, ji bo vê yekê êrişî girtîgehan kirin. Van êrişan jî nîşan didan ku:

Barê jînê

Barê têkoşînê

Barê berxwedanê

Ü evîna welat hemî bar li ser milê girtiyan û li ser milê malbatêن wan bû.

Dayik û xuşkên me

Destgirtî û birayêن me

Xanim û zarokên me barê têkoşînê hildabûn. Girtiyan pir êş û zehmetî kişandin. Gelek neheqî û işkence dîtin. Lê qahramanên herî mezin dayik û birayêن me, bav û xanimêن me xuşk û zarokên me bûn.

Di havîn û zivistana Amedê de

Biheqeret

Bineheqî

Bişkencan li ber deriyê girtîgehê rojên xwe derbas dikirin.

Şevêن bêxew

Şevêن biş

Şevêن bihesreta zarok û evîndaran, êşa xanima, pêncî şêst rojên rojên birçîbûnê her roj, her seet ji bo wan mirin bû, guhê wan li ser nûçeyen ji girtîgehan dihatin bû. Bi fedakarîyek mezin bi şev û roj piştgiriya me dikirin.

Di wê demê de li hember hemî astengî û qedexekirina dewletê, zîndî mayina hisêن netewî bi berxwedan û têkoşîna girtîyan û malbatêن wan ve bû....

(.....)

Têbinî: Ev nîvîs ji pirtûka Seracettîn Kirici "Êşa Hadepê Jana Amedê" hate wergirtin.



DI ZÎNDANÊ DE KARÛBARÊ REWŞENBÎRÎ

Xidir Egît

Mirovên ku bi bawerîya îdeolojîyek civakî û netewî xebatek siyasi meşandin û di encama vê xebatê de ku di 12 Îlonê de hatin dîl kîrin û ketin zîndanê, him bi xwe re û him jî bi hevalên xwe re, li ser rewşa sîyasî, rîexistinî, ramîyarî û edebî ji nû de ketin nirxandin û gengeşîyekê. Sazûmana 12 Îlonê ya faşîst, her çiqas li ser girtîyên sîyasî - bi taybetî jî li ser dîlên Kurd yên zîndana Amedê- li dor sê sala teror û işkencak bi hovîti meşand, hemû berhemên çapemenîyê û xebatên di vî warî de qedexe kir jî, di her fersendê de, di her mijara rewşenbirî de xebat û lêkolînên girîng û berfereh hatin meşandin.

Hetanî wê demê, kesên ku bi kar û xebata sîyasî dibilîyan, ji bo ku bi piranî ne xwedîyê perwer-debûnek rasterê û bi giranî di hundir têkoşînek pratîk de bûn, ji alî warê kulturî, ramîyarî, lêkolîn û analîzî, nivîsandinên teorîk û edebî dibûn xwedîyê paşdemayîn û valahîyekê. Di vê pêvajoyê de, hinek kes, him ji bo ku di xebata xwe ya pratîk de têk çûn, hinek hêvî û daxwazê wan şikestin û him jî ketin zanîna kêmanîyên xwe, ketin bin barê berpirsiyariya xebata di van waran de.

Di zîndanê de mirov li hemberî her kemasî û qelsîya xwe şîlfî tazî û bêcek e. Ya rastî li ku dibe bila bibe, mirov nikane ji rastîya xwe bireve. Divê bi nezanî û kêmanîyên xwe re têkeve tekoşînekê; an meriv di pêvajoya jîyana xwe de tucarî nikane bibe xwedîyê ramanek azad û helwestek serbixwe. Ev têgehîstinek pir girîng e. Wê gavê mirov, wê kanibe xwe di analîza rexnê re derbas bike, ji xwe pîrsan bike û li bersîva van pîrsan bigere. Mîna ku ez kî me; cihê min yê di civakê û li cîhanê ci ye û li ku ye; mafê min yê mirovî, civakî û netewî ci ne; sîyaset, îdeolojî, felsefe, kultur û dîroka vana tevan ci ye; dîroka cîhanê, xwezayê, mirovahî û ya her tiştî ci ye? Lê bersîvdana vana, ji tu kesî re ne hêsan e. Jê re xebatek kûr û dûrdirêj pêwîst e. Divê mirov jîyana xwe li gorî plan û programekê saz bike. Ne li ser mijarekê, mîna ku li zanîngehekê dixwîne, divê li ser gelek mijaran lêkolîn bike û xwe perwede bike. Encax ew dê wê gavê bigehîje mîzîna hînbûna zanînek têkûz. Lê di zîndanê de, hela di bin êrîş û tadayekê de xwe perwedekirin û jînanek bi dîsîplîn gelekî zehmet e. Li alî din jî mirov bi piralî di hundir psîkolojîyek tevlehev de ye. Him pêtivî û fonksiyonê bedena xwe nikane bîne cîh, him jî pêwendî û têkilîyên xwe yên bi civak û xwezayê re bi dûr ketîye, him jî ji rûmet û hezkirina der û

dora xwe qetiya ye. Evana balcivandin û konsantra mirov xera dike. Gava ku meriv, li hember êrişên rêvebirîyê hertim xwe di hundir amadekarîyekê de his bike, wê gavê dê rewşa xebata rewşenbirî ya li zîndanê bêtir bê têgehîstin. Di vê rewşê de, kesên ku bixwaze xwe perwerde bike û berheman biafrîne, divê xwedîyê îrade, sebir, psîkolojî û biryarkarîyek zehf qewîn be.



Herkes dibe di zîndanê de, di demnî xwenî vala de wek hobî li ser zimanekî xerîb bixebite, an rahêje pirtûk, kovar, rojnamekê bixwîne. Lê kesên ku rewşenbirî kirin karê xwe, xebata di vî warî de, ji xwe re mîna şêwekî jîyanê pejirandin, mîna şêwekî têkoşînê, vatînî û berpirsîyariyek li hemberî xwe û civaka xwe û mirovahîyê dîtin. Tu carî destur nedan xwe ku sanîyek wan vala biçe. Lê mixabin kesên vê rewşê di zîndanê de pir hindik bûn.

Hinek mirov jî di bin hinek kompleks de, bi armancnî bi sînor di warnî teng de dixebeitîn, an bê lêkolîn û zanînek berfereh digotin em ê pirtûkek helbestan, serpêhatî an romanekê binivîsin. Gava ku bi armanc û zanînek teng, bi yekalî li ser mijarekê bê xebitandin, ne berhemên bi qalîte tê afirandin, ne jî berhimandin tê berdewamkirin. Bêimkane ku mirov di her warî de, an di gelek waran de bi hevre bibe pîspor, lê divê di her mijarê de pir-hindik xwedîyê agahdarîyekê be.

*L*i gorî min, ji bo jîyana mirov ya ramiyarî û hisî, edebîyat cihekî girîng û taybetî digire. Pir-hindik pêwîstîya herkesî bi xwendin û gohdarîkirina vê mijarê heye. Ku mirov baş hînî ramandinê nebûbe, birastî nikane analîza jîyan û pirsgirêkên xwe jî bike. Zîndan, ji bo ramandinê cihê herî rewa ye. Lê ji bo di ramanê xwe de meriv analîza mijarên girîng bike, divê bi pevgirêdanek diyalektîk mirov gotin û hevokên dûrdirêj di hundir ahengekê de damezirîne. Lê ev rewş ji kesên neperwerdekirî re ne hêsan e û zehf zehmet e. Li gorî min, ji bo mirov bigehê vê armancê, divê bi xwendin û lêkolîna edebîyatê mijûl bibe. Ji bo ku têgihîstina roman, helbest û serpêhatîyan ji xwendevanan re hêsanter e, zîndanîyêni siyasî bi pirahî û bi kêfxweşîyekê pêşî dest avêtin xwendina van berheman. Edebîyat, tenê ne di warê ramandinê de, li gorî mijarên berheman di her warî de mirov perwerde dike. Ew bi gelek alî hêzek afirandêrîyê dide meriv. Loma mirovên di zîndanan de berhemên ku nivîsandin, bi piranî berhemên edebî ne.

Sedema ku girtî bi giranî bi edebîyatê têkil dibin, belkî hinek jî bi hisên wan yên li zincîran hatiye xistin girêdayî ye. Pirê girtîyan bi xebata edebî ya di zîndanê de ketin cudahîya gelek tiştêx xweza û civakê, yên gava ku ew di nav wan de dijîyan ku ne di cudahîya wan de bûn. Loma bi armanca tecrûbe û serhatîyê xwe jî têxin ser van bîrbirinê xwe, dest bi berhemên edebî kirin. Lê mirov mîna ku di tevê jîyana xwe de, lê di zîndanê de hîn bêtir, guhêrbar e. Mîna tembelî û tolazîyê, ya hinek hêlîn jîyanê bi meriv pir şerîn û hêsan tê, yan jî li dû zanînek berfereh, jîyan pê bêwate tê, loma dev ji vî karê bi sergêjanî jî berdi-de. Hinek jî dixwazin jîyana xwe bi mane bikin, loma dixwazin zanîn, tecrûbe, serhatî, his, bîrûbawerîyê xwe bi herkesî re payê bikin û bi vê bawerîyê xebata xwe ya hunermendî, edebî û afirandêrî berdewam bikin.

Adîl Dûran

Raman di mabeyna mirovan de heyi ye ke hevpişki ye û malê hemûyan e. Bi taybeti bir û baweri, çand û raman sedemeke mezin e, da ku di civatan de nêzikbûnên şexsi bi sereta yên xusisi pêk bêñ.

Lê mixabin di civat a Romi de bi bîr û baweriya fermî ya Nijadperest gelên cur be cur û Netewe yê Kurd xistiye nav qalibeki û tê de zexm guwiştiye. Ji ber ku Romi şerker in, qarekterê zordestiyê di Çanda wan de heye.

Ji mêj ve heya roja iroyin pirsgirêkên girtigeh an çareser nebû ye û her wek tişteki tabî perçek ji, jiyana wan girtigehin. Girtiyê adi reng û dengê xwe dane huner û Çand.Roman, film, serpêhati û nivis tune ku tê de bûyerên girtiyan ango girtigehan derbaz nebe. Tê gotin : "Girtigeh cihê mîran e, divê camêr tim û tim nivineki xwe li girtigehê hebe.."

Di van salêن dawiyê de ew reng û dengê girtigehan ji sedem serhildan û livinêن girtiyan yên siyasi gelek hate guhurandinê. Di wari mafê mirovande dengveda û gelempéri nav û deng bû. Disa ji Dewletê dagirker bê şerm û fêdi kirin karê xwe

yi qirêj pêşta bir. Mirovên siyasi bi hezaran hatin raçavkirin, êşkence ditin û hatin kuştinê, gelek kes ji wanen dil û bende bûn. Anglo xeyni yên ku hê ji dayêk nebûne, hema, hema ew şexsê ku êşkence û tade neditime, ew niviskar û hunermend û rewşenbirê ku di Çerxa girtigehande derbaz nebûne tunin..

Girtigeh ciheki monoton e, li wir jiyan bi yekali ye. Meriv bi derweyi hemdê xwe û bê daxweziya xwe dikeve nav Çilekêşîyeke mezin.Yên ku dikarin xwe ra girin û berxwe bidin û ji xwe bi xwe re mijareke bibinin ew tenê dikarin xwe jî, ji tengasiyan û xwe bi xwe kuştinê rizgar bikin. Ji ber ku mirov bi salan di çaviyeke piçûk da ye û hawirdor ji duwarin, hewa tune û ji rojê çend saet derdikevin hewşê, bi hevûdu re têkili datinin. Car, caran ji ev têkili ji nabe..Di bin wan şert û zurifêن tunebûnê de, girtiyê siyasi car, caran hin tiştan pêk tinin ku ne karê tu aqilan e.

Mirovên ku heri zêde dixwinin ew in. Zahmetkêşê heri mezin ew in û bime yên (sigorta) şoreşê ji ew in. Laşê vanan girtiye lê Aso yên wan gelek fireh û azad e. Di hundur de têkili jiyana derive dibin û bandurkêr in. Dadi û regeze yên

wan yên tayberi hene. Bi ehlaq in. Bi sereta yên şoreşê jiyanâ rojane rêk û pêk dîkin. Pêveberdan tune. Di dinêde Sosyalizm jiyanê de kar nehat, lê girtiyên şoreşger bi qeyde sosyalizmê dijin. Di wari Çand, huner û wîje de gelek berhem di afirin. Berhemêwan hêja yi nayê helsengandin. Ji ber ku imkaniyetêwan nine, rêxistin û sazumanêni siyasi lê xwedi dernakevin! Disa jî hin kesan bi imkanêni xwe serketin, berhemêni nemir jî, ji pêşerojê re hiştin. Berhemêwan ji mera rêberi yê dîkin, sî sal berê jî wisani bû bû, bîst sal berê jî wisani bû bû û iro jî her wisani e. Orhan Kemal, Yaşar Kemal, Aziz Nesin, Sabahattin Ali, Nazim Hikmet, Yılmaz Güney, Osman Sebri, Cigerxwin, İsmail Beşikçi, Haluk Gerger, Musa Anter, Mehdi-Leyla Zana, Mehmet Uzun û gelekkereşenbir, wijekar, hunermend û şexsiyetêni hêja û nemir bi sedan kesen han tew girtigehan derbaz bûn û ji mere berhemêni nemir afirandin. Lê yên ku derive ne ji ber kar û bar û livinêni rojane zemanê wan tune ku ramanêni xwe kûr û dur hêja bikin. Girtî ji bo afirandina berheman plan û projeyen xwe di hundur de raman dîkin, birc û bingehê berhemêwan li ser esasen jiyanê ava dibe, léger û lêkolinêni wan yên têkûz li gor şert û zurifêni welêt tê pejirandin... Dert eve ku sazumanêni siyasi nikarin raste rast rê vekin, demê ku pirek di navbeyna girtî û civakê de bê ava kirin ji bo agahdari yê rojane ev kombuna ramanan û zanina salan dê bigihe tevahiya civatê û agirê şoreşê bê pêt girtin û bi bani keve..

Bêguman hin şaş ditin û çewti û pêşdarazi ji hene:

1.) Hin rêxistin ji bo kesen ku hatine girtinê dikevin dubendi û pêşdaraziyeke xerab, wek ko, girti dil û bende yê dijmin in, dibe ku dijmin wan biguhêri û bi xapini.

2.) Hin girti jî di bin êşkence û zordestiyê de berxwedaneke tebatî "pasiv" didin. Wek şexsek

pêşveru, demokrat û hwd. xwe di parêzin, da ku li gor mercen dadiya dijmin ceza giran nexwin û zûtirin jî, ji girtigehê bikaribin azad bibin. Ber ku bûyeren rêxistini nagirin ser xwe û durişmê xwe jî, ji tevger a rêxistini cuda digirin. Rewşa wanana her wek hulhuli tê ditin.



3.) Hin girti ji demê ku dikevin hundur kar û barê wan yê derive nivce dimine û cihê wan zu bi zu nayê dagirtin û ew wek rojêni berê nikarin tevgera şoreşê de rolê xwe bileyizin, ji Çavan dûr, ji dilan dûr diminin.

4.) Yên ku di berxwedanêni mezin de, di bin êşkence û tade yan de şehid dikevin ji ew direwş in. Bendewarêni nemir in.

Ji bili van dilbiriniyan hin sedemêni rewnaq ji hene nayêni ditin. Disa jî ez iddia dikim zaningeşen şoreşê girtigeh in!

PIRTÛKÊN LI SER ZINDANA AMEDÊ (DİYARBEKIRÊ)

Lokman Polat

Aghdariyek Kurt

Min vê nivîsa li jêr çend sal berê nivîsibû û ev nivîs di kovara "Stêrka Rizgarî" de hatibû weşandinê. Piştê vê nivîsê li ser zîndana Amedê hinek pirtûkên din jî hatin weşandinê, min wan pirtûkan jî xwend û li ser wan nivîsî. Ji bo vê yekê ez vê nivîsê carekî din bi temamî diweşînim. Kovara "Stêrka Rizgarî" li Stenbolê derdiket û hemû hejmarên wê hatine qedexekirin. Dibe ku gelek xwendevanê HELWESTê kovara "Stêrka Rizgarî" nebînin û vê nivîsa li jêr nexwînin. Loma min pêwîstiya ji nû ve weşandina vê nivîsê dît.

Lokman POLAT

Zindana Amedê neynika(ayna) faşîzma dewleta Tîrka ye. Piştê 12 Îlonê Kemalîstên faşîst li zindana Amedê zor û wehsetîyek mezin, barbarîyêk nedîtî li dij gelê Kurd, mîrovêñ welatparêz, şoreşger û hemû pêşveruyan bi kar anîn.

Li ser zindana Amedê, li ser zîlma faşîzma dewleta tîrk û berxwedana li dij kolonyalîstên(dagirkirêñ) faşîst gelek pirtûk hatine nivîsandin û hatine weşandinê. Di vê mijarê de tiştê balkêş eve ku, ew pirtûkên ku li ser zindana Amedê hatin

weşandinê hemû jî bi zimanê tîrkî bû. Nivîskar Laleş Qaso(ew bi xwe çend sal di zindana Amedê de raza ye) vê qaîdê şikand û li ser zindana Amedê bi Kurdfî pirtûk nivîsand. Navê pirtûka Laleş Qaso "Zîndanêñ Diyarbekirê û Şoreşgerîya me" ye. Pirtûk cîlda yekem e. Di nav weşanêñ PELDA de derketîye. Cîlda pirtûkê ya duyem hêj nehatîye weşandinê.

Berîya ku ez li ser vê pirtûkê bisekinim, bi kurtayî be jî, ez dixwazim behsa ew pirtûkên ku bi zimanê Tîrkî derketibûn û hemûjî li ser zindana Amedê bûn, bisekinim.

Li ser zindana Amedê pirtûka yekem a Avuqat Şerefetîn Kaya bû. Ew hatibû girtin, gelek şkence dîtibû û piştê ku hatibû berdanê li ser rewşa dilketîyêñ zindana Amedê, li ser cûrecûre metodêñ şkencê ku li dij girtîyan ji alî dewleta tîrk bi kar danîyan, sekinîbû. Navê pirtûka Şerefetîn Kaya bi tîrkî "Diyarbakır'da İşkence" bû.

Piştê pirtûka Şerefetîn Kaya, vêca F. Welat li ser zindana Amedê pirtûk nivîsand. Navê pirtûka wî jî "Diyarbekir 5. Nolu" bû. Pirtûk bi zimanê tîrkî hatibû nivîsandin. Ev pirtûk hetanî nûha du

car hate çapkiran. Çapa yekem di nav weşanên “Özgürlik Yolu—Rîya Azadî” de, çapa duyem jî di nav weşanên “Dîlan” de, li Dîyarbekirê hate çapkiran. F. Welat di pirtûkê de qala(behsa) girtina xwe, şkencê ku dîtîye û şkencê ku di zindanên hepisxana—girtîxana— Amedê—Dîyarbekirê de li girtîyan dikirin bi awayek objektif tînê zimên. Ev pirtûk bê alî û bi metodêk realist hatîye nivîsandinê.

Piştê van herdu pirtûkên ewil, paşê hendî gelek pirtûk li ser zindana Amedê hatin nivîsandin û çapkiran. Hinek ji wan pirtûkan wek Roman, Serpêhatî û Çîrok , yên din jî wek raporê zanîstî hatibûn nivîsandin û weşandin.

Pirtûkên ku wek raporan hatibûn nivîsandin evin:

1 — Diyarbakır Hapishane Raporu

Cîld-1 û 2 derketîye. Cîlda sêyem hêj derketîye. Ev herdu cîld li ser hev 622 rûpel in. Di nav weşanên Rizgarî de bê îmze derketin. Lê ji raporan têt famkirin ku, Mumtaz Kotan û Ruşen Aslan ev raporan amade kirine. Rapor li ser hemû babetên şkencê, li ser mahkeman(dadgehan), li ser têkilî û nakokîyên di nav hêzên siyasi yên Kurda, li hepisxanê(girtîxanê) û li ser gelek tiştên din, pirr fireh û dûr û dirêj sekînîye. Rapor bi metodek gelek zanîstî û huquqî hatîye nivîsandin. Li ser jîyana girtîyan di nav hepisxanê de gelek tiştên balkêş hene.

Nivîsandina raporan wek nivîsandina çîrok, serpêhatî an jî romanan nîn e. Di romanan de tiştên xeyalî gelek zêde ne. Di raporan de tiştên xeyalî nabe ku mirov binivîsînê. Ev tiştên ku di van herdu cîldan de hatîye nivîsandin, çawan ewqas di heşê nivîskaran de maye?!. Ewqas bûyer çawan hatine bîra wan? (Lewra, tiştên ku di raporan de têt qalkirin pêvajoya çend salan e) mirov şas dimînê. Xuya ye, yên ku raporê amade kirine gelek jîr in û pirr tiştan di heşê xwe de hêştine, ji bîr nekirine. Divê welatparêz û şoreşgerên Kurd,

pirtûkên ku li ser zindanên Amedê hatine nivîsandin(bi tirkî yan jî bi Kurdî, Roman,serpêhatî, Çîrok û Rapor) bixwînin. Mirovên ku neketine zîndanê jî divê van pirtûkan bixwînin û fêr bibin ku li Zindana Amedê girtîyan çawan—ji bo doza gel û welatê xwe—zehmetî kişandine û di berxweda dane.

Ev pirtûkên ku li ser zindana Amedê hatine nivîsandin hemû jî wek Belge ne. Dê bikevin nav rûpelên dîrokê.

2 — Diyarbakır Zindan Direnişi “Berxwedana Zîndana Amedê” Mehmet Can Yuce

Pirtûkek jî Mehmet Can Yuce nivîsandîye. Ev pirtûk jî wek raporek siyasi hatîye amadekirin. Navê Pirtûkê bi tirkî “Diyarbakır Zindan Direnişi—Berxwedana Zîndana Amedê”— ye. Pirtûk 221 rûpel e. Di nav weşanên Serxwebûnê de derket. Di pirtûkê de bi giranî li ser berxwedanên girtîyan û berxwedanên gireva birçîbûnê disekinê. Di pirtûkê de hinek bûyerên ku di hepisxanê(girtîxanê) de qewimîne, gelek bi yek alî tête qalkirin. Lê, ji bo hinek tiştan jî gelek bi rastî behsa wan bûyeran kirîye.

Weşanxaneya Serxwebûnê vê pirtûkê weşand. Lê, paşê ji ber hinek sedeman vê pirtûkê nefrotin, belav nekir in. Ji bo ku di pirtûkê de henîk tiş hebû û ew jî hesabê weşanên Serxwebûnê nedihat, loma jî vê pirtûkê ji holê rakirin.

3 — İradenin Zaferi — Serketina İradê— Hasan Özen û Nesîmî Kılıç

Ev pirtûk gelek balkêş e. Ji bo militanan dersên pratîk li ser metodên şkencê û berxwedanê de dide. Yên ku vê pirtûkê nivîsandine hêj jî di hefsê de radizin. Di sala 1989 û 1990'î de vê pirtûkê di hepisxanê de nivîsandine.

Di pirtûkê de li ser di şkencê de berxwedan, di mehkeman(dadgehan)de helwestên şoreşgerî, di jîyana şoreşgerî de parastina tiştên sirî(dizî), li ser şkencen şokê, û li ser gelek tiştên din bi berfirehî hatîye sekinandin. Di dawîya pirtûkê de jî li ser "Portra Xayînek-Bir ihanetçinin Portresi—" nivîsek balkêş heye. Pirtûk 179 rûpel e. Di nav weşanên Serxwebûnê de derketîye.

Pirtûkên ku li ser zîndana Amedê bi metoda Roman, Serpêhatî û Çîrok hatine nivîsandin jî ev in:

1— 12 Eylul Karanlığında Diyarbakır Şafâğı

Di Tarîtiya 12'ê Îlonê de Berbangâ Amedê

Selîm Çürükkaya - Weşanên Agrî

Selîm Çürükkaya du cîld roman li ser zindanên Amedê û berxwedana girtîyan nivîsandîye. Herdu cîldên pirtûkê di nav weşanên Agrî de hatîye weşandinê. Cîlda wî ya sêyem hêj derneketîye.

Selîm van herdu cîldên pirtûka xwe gelek bi yek alî û bi teref nivîsandîye. Ji objektîfê dûr ketîye. Bûyeran bi çavekî realist nenivîsandîye. Ji bo ku bi mejîyê bi teref girtîyan(âlîgirtîyan) pirtûkên xwe nivîsandîye, di hinek tiştan de ji rastîyê derketîye. Gelek tiştan pirr bi mubalexe nivîsandîye.

Selîm li ser rewşa girtîyan û berxwedanên wan gelek dûr û dirêj(metoda romanê bi kar anîye) sekinîye. Di dawîya cîlda yekem de li ser metodên şkencê, 27 wêneyên(resim) gelek balkêş hene. Van wêneyan Zulfikar Tak çêkirîye. Di wêneyan de wênevan metot û teknîka şkencê gelek xwe hanîye ber çavan.

Li gor ku Selîm agahdarî dide xwendevanan, hinek besên pirtûkê Sakîne Cansız nivîsandîye, lê ew tiştên ku wê nivîsandîye paşê ji alîyê dagirkerên tirkâ ve hatîye îmha kirin. Ji bo vê yekê

nameyêk ku Sakînê li ser qowîşa jinan nivîsandîye girtîye vê cîlda yekem. Cîlda duyem jî bi giranî li ser berxwedanên girtîyên keç û jinan e.

2 — Dörtlerin Gecesi — Fevzî Yetkîn û Mehmet Tanboga — Weşanên Yurt

Ev pirtûk gelek xweşa min çû. Lewra hemû jî rastîyê nivîsandîye. Rewşa qowîşa ku ew têde bûne, rewşa girtîyan, teslimbûna wan, çawan îtiâtê sazumana hepışxanê kirine, hemû jî bi rastî nivîsandine. Heta kîngê teslim bûne û ji kîngê ve-jî kîjan dem ve- di berxwede dane, paşê çar girtîyan çawan biryara xweşewitandinê dane û xwe çawan şewitandine, bi mejîyek objektîf û bi çavekî realist nivîsandine. Di pirtûkê de bi rastî jî wehşet û barbarîya ku dagirkerên tirk li ser girtîyên Kurd pêk anîne hatîye qalkirin. Wek têt zanîn Ferhat Kurtay, Eşref Anyik, Mahmûd Zengîn û Necmî Oner, ji bo kirinên dagirkeran, zilm û zordarîya wan, wehşet û barbarîya wan protesto bikin û rîya berxwedanê ji girtîyan re vekin, canê xwe kirin feda, xwe bi destê xwe şewitandin. Ev pirtûk bûyera şewitandina wan çar lehengan qal dike.

3 — KAMBER ATEŞ ÇAWANÎ?

"Çîrokên ji girtîxanê"

(Kamber Ateş Nasılsın?)

"Hapishanededen öyküler"

Ev pirtûk ji alî Komela mafêن mirovan(İHD) lîqê Amedê (Diyarbekir) hatîye amadekirin. Di pirtûkê de çîrokên ku bûyerên wan li zindana Diyarbekirê derbas bûye têt qalkirin. Yênu van çîrokan nivîsandîne hemû jî di hepışxana Amedê de razane. Di pirtûkê de 15 çîrok hene. Di çîrokan de şkenca dagirkerên Tirk li ser girtîyan û berxwedanên girtîyan tê şîrovekirin.

Di nav çîroknivîsan de şehîdê nemir Wedat Aydin jî heye. Wedat Aydin di çîroka xwe de qala hepışxana Dîyarbekir dike û rewşa dadgehêن (Mehkemêن) Tirka tînê ber çavan.

Pirtûk bi zimanê Tirkî ye û di nav weşanên "Belge" de hatîye weşandinê. Pirtûk 120 rûpele. Nivîskarên çîrok û serpêhatîyan ê vê pirtûkê yên din jî evin: Edip Polat, Saït Efe, M. Deniz, Rûşen Sumbuloglu, İdrîs Guzel, Bîrol Keskin, Gunay Çoban, İbrahîm Ulutaş.

4 — Bekle Diyarbekir – Bisekine Amed-Mehdî Zana – Weşanên Doz

Pirtûka Mehdî Zana li ser şkence û zîndana Amedê ye. Pirtûk bi zimanê tirkî hatîye nivîsandin. Mehdî Zana baş Kurdî zanê, çîra pirtûka xwe bi Kurdî nenivîsandîye? Mehdî bi destê xwe pirtûkê nenivîsandîye, wî gotîye û mirovek din jî nivîsandîye. Dibe ku yên din bi Kurdî nizanibe, loma jî bi tirkî nivîsandîye.

Di pirtûkê de Mehdî Zana gelek zêde li ser piçûkahîya xwe, li ser xebatêن xwe yên di nav DDKO û paşê TÎP'ê de jî sekinîye. Di besên paşîn de jî Mehdî Zana girtina xwe û şkencê ku dîtiye qal(behs) dike. Di pirtûkê de pirr mubalexe û gelek tiştên ne rast jî hene. Mehdî di pirtûkê de dema serokatîya Beledîya Amedê û helbijartina xwe bi çavekî objektîf nenirxandîye. Ji bo wê demê nirxandinêk realist nekirîye. Di pirtûkê de li ser hinek bûyeran (wek mînak, bûyera greva karkerên Beledîyê) tiştên yek alî û nerast hatîye qalkirin. Gelek tiştên şas di pirtûkê de heye, lê ez naxwazim dûr û dirêj li ser wan şâşyan bisekinim û rexne lêbigirim.

5 — Devlet İşkence Buyurdu – Diyarbakır'da Eylül Karanlığı Vedat Guzel - Weşanên Pelêsor

Ev pirtûk 190 rûpel e. Bi tirkî hatîye nivîsandin. Vedat Guzel çend car hatîye girtin û di hepsê (girtîgehê) de raza ye. Di pirtûkê de serpêhatîyên Vedat Guzel heye. Gelek tişt hatîye serê wî. Vedat, pirtûka xwe bi metoda Psiko-Cîvakî nirxandîye. Vedat bi xwe hekîm e û pirtûkê jî li gor psîkolojîyê nivîsandîye.

Vedad li ser girtina xwe û şkencê ku dîtiye gelek dirêj qal(behs) dike. Di dawîya pirtûkaê da jî, çar besên cîhê hene. Di beşa yekem de "Di Diyarbekir de teknîk û usûlên şkencê", di beşa duyem de "Sucdarî û dadgeh", di beşa sêyem de "Şkence û şkenceci", di beşa çarem de jî "Mirov û İrade" heye. Ev her çar beş jî gelek balkêşin.

6 — Gardîyan – Bubê Eser – Weşanên Roja Nû

Min di destpêka vê nivîsê de gotibû ku; Pirtûkên ku li ser zindana Amedê hatine nivîsandin hemû jî —xeynê pirtûka Laleş Qaso— bi zimanê tirkî hatine nivîsandin. Pişte pirtûka Laleş Qaso a bi Kurdî, nûha jî Bubê Eser li ser zindana Amedê, bi navê "Gardîyan" pirtûkek bi Kurdî nivîsandîye. Ev pirtûk di nav weşanên Roja Nû de hate weşandinê.

Pirtûk wek metoda serpêhatî û romanê hatîye nivîsandin. Ji devê Sîdar û paşê jî ji devê Gardîyanek li ser rewşa girtîyan û girtîgehê disekinê. Pirtûk 165 rûpel e. Lê têde dûbare pirr in. Gelek tişt hatine dûbarekîrin. Erê pirtûk 165 rûpel e, lê bi a min ev pirtûk di eslê xwe de 48 rûpel e. Pişte rûpela 48'tan ji devê Gardîyan eynê tişt hatine dûbarekîrin, çarekî din hatîye qalkirin. Gardîyan jî dawîyê xwe di darde dike, dieliqînê.

Bubê navê-numara- qowîşa ku ew têde bûye qet nade. Wek têt zanîn hinek qowîş di berxweda nedan. Qowîşa ku Bubê jî têde bû, gelo ketibû berxwedanê?. Qehremanê-Lehengê- pirtûkê Sîdar, çiqas di berxwede dabû?. Ew qet ketibû gireva birçîbûnê?.

Naverok û kêmanîya pirtûkê li cîhêk, Bubê gelek baş kirîye ku pirtûka xwe bi zimanê Kurdî nivîsandîye.

7 — Zindanê Dîyarbekirê û Şoreşgerîya Me Laleş Qaso – Weşanên Pelda

Vêca em bêñ li ser pirtûka Laleş Qaso. Ev pirtûk 285 rûpel e û cîlda yekem e. Laleş Qaso li ser zindan Amedê pirtûk nivîsandîye lê, qategorîya pirtûkê beylû nîn e. Ev pirtûk romane, bîranîne, çîroke, serpêhatîye, an jî pirtûka rexnegirîyê ye? Mirov dikare bije tiştêk jî nîne, an jî hemû tişte. Lê, li gor metoda nivîsandina pirtûkê, mirov dikare bêje ku pirtûk bi naveroka xwe serpêhatîyêن Laleş Qaso ne.

Nivîskarê pirtûkê qala bûyerên ku piştê 12 Ilonê hatine serê wî, tiştên ku wî dîtîye, tiştên ku di serê wî de derbas bûye qal dike. Reva wî, çûndina wî ya Kurdistana başûr û rojhilat, girtina wî, di girtîgehê de zilma Mehmetcikên tîrkan, Li qawîşan şkence û gelek tiştên din, qal(behs) dike. Laleş Qaso di pirtûka xwe de gelek rexne li rêexistinê Kurda û li çend kadir û sexsiyetê Kurda jî digirê. Ji xwe di pirtûkê de tema rexnegirîyê bi giranî cîh girtîye.

Laleş Qaso, çûndina xwe ya Kurdistana Rojhilat(Îran), seknandina xwe ya li cem rêexistina Komela'yê û zewicandina Hatîce Yaşarê bi Mehmed Muhtedî re bi gelek balkêşî qal(behs) kirîye. Çira qal kirîye?, Zewaca Heco bi wî ketîye?. Tiştêk nayê famkirin. Laleş Qaso, li ser kirinên Hatîce Yaşarê gelek disekine. Çira hewce dîye ewqas sekinîye?, ne dîyare.


Laleş Qaso, di pirtûka xwe de li gelek rêexistinê Kurd(yên Kurdistana başûr û bakûr) rexneyêن di cîde û ne di cîde digirê. Ew çira ewqas bûye dijê rêexistinê Kurda, ev jî ne dîyare.

Wek ku min li jorê vê nivîsê de jî gotibû Laleş Qaso, gelek rexneyêن negatîf li rêexistinê Kurdan digire. Lê, li gel vê regnegirîya wî ya negatif hinek tiştên pozitîf jî dibêje û ji bo rêexistina KUK û Rizgarî'yê vê rastîyê tînê zimên, weha dibêje:

—“Jîr û zanatîya di Rizgarî de bêhempa bû. Di KUK'ê de Kurdperestîyek delal hebû.”

Laleş Qaso di kovara Hevdem de nivîs-meqalebi Kurdî dînîvîsîne. Ew nûha li ser pirtûka xwe, cîlda dûyem dixebite. Ka, em binêrin di wê cîlda duyem de qala (behsa) ci dike.

Min di vê nivîsê de pirtûkên ku li ser zîndana Amedê hatibûn weşandin-yêن ku ketibû destê min û min xwendibû- da danasînê. Helbet dibe ku li ser zîndana Amedê hinek pirtûkên din jî hebin, lê ew pirtûk ji bo ku neketine destê min û min ewan nexwendîye, loma jî ez nikaribûm wan bidim danasînê. Ji vê rojê û pêve, pirtûkên ku li ser zîndana Amedê derkevin ezê wan jî bidim danasînê.



ÊŞA HADEPÊ, JANA AMEDÊ

K. Helwest


Seracettîn Kirici Kurdekkî sîyasetmedar e. Wî di beriya 12'ê Îlonê de dest bi şoreşgeriyê kiribû. Di nav rîexistinek Kurd yê welatparêz de kar û xebata siyasî dikir. Piştî 12'ê Îlonê hate girtin, bi salan zîndanên cunta faşist de raza. Piştê ku ji hepisê hate berdanê dîsa kar û barê xwe yê siyasî domand. Wî di nav HEP, DEP û HADEP'ê de kar û barêni siyasî yên hêja kir e.

Sîracettîn wextaku di komîteya birêvebir a HADEP'ê de bû, carek din hate girtin. Ji salekî zêdetir di hepisê de raza. Di hepisxaneyê de dest bi nivîsîna helbestan kir, helbest nivîsand. Wî kar û xebata xwe ya siyasî jî wek bîranîn nivîsî. Sîracettîn wextaku ji hepisê derket du berhemên hêja di bin cengên wî de bû. Ew herdu berhemên wî di nav weşanê SOR de hatin weşandinê. Herdu berhem jî bi Kurdî bûn. Yek jê navê wê "Nalîna Çevê" -helbest-, û ya din jî "Êşa Hadepê, Jana Amedê" -bîranîn- bû.

KURDÎ NIVÎSÎN BERPIRSIYARÎ YE

Sîracettîn dibêje "Kurdî nivîsîn berpirsiyarî ye." Ev gotinên wî gelek rast in. Ew jî wek hemû Kurdên welatparêz iştîram dide nivîsîna Kurdî. Ew dibêje : " Nivîskarêni Kurd bi nivîsandina Kurdî dikarin Kurdî pêşve bixin." Zimanê Kurdî bi nivîsînê pêşve diçe. Axaftin û nivîsandina bi Kurdî hebûna Kurdî ye. Kurdî ne tenê zimanê ax-

aftinê ye, her weha wek her zimanî zimanê nivîsînê ye. Sîracettîn dixwaze ku; Kurd weşanên Kurdî bixwînin.



ŞAHÎDIYA BÎRANÎNAN

Sîracettîn di pirtûka xwe ya bi navê "Êşa Hadepê, Jana Amedê" de bîranînen xwe civandiye. Ew wexta ku bîranînen xwe qal dike, pêre pêvajoya tevgera Kurdî ya polîtîk jî qal dike. Wî êşen ku berê hatine kişandin nivîsiye. Bûyerên dema nêzîk bi bîr anîye.

Pişte kongreya HADEPê ya sala 1996'an de

Sîracettîn têt girtin. Wî dixin hepisxaneya Elmadağ'ê. Li wir dest bi nivîsina vê pirtûkê dike. Bîranînên xwe bi bîr tîne û diçe ta sala 1978'an. Di hepisxaneya Amedê, Ceyhanê û Vîranşehrê de çi jiyaye tîne zimên. Ew di zîndana Amedê de dikeve nav berxwedanê, dibe şahîdê şehîdbûna Mazlûm Doğan û Necmetîn Buyukkaya. Di hepisxaneya Ceyhanê de beşdarê greva birçîbûnê dibe û felc dibe. Ew van bîranînên xwe wek romanek li hev dihone û bi zimanek herîkbar qal dike. Ev bîranînên wî ji dîrokê re dibe şahîdiyek.

HELBEST BI ÈŞÊ TÊN NIVÎSÎN

Erê! Helbest bi êşê tê nivîsîn. Èşa gel, èşa welat, èşa netewî û civakî û èşa ku mirov bi xwe dikşîne. Heger Sîracettîn van êşan di can û rihê xwe de, di hestê xwe de hîs nekirana, heger wî gelek derd û kul, êş û kelem nedîtana dê bikaribana van helbestan binivîsandana? Helbestêن “Nalîna Şevê” helbestêن êşê ne, yên hawar û qêrîn û nalînê ne.

Li gor agahdariya ku Sîracettîn daye rojnameya rojana, wî di serî de nexwestiye ku helbestêن xwe wek pirtûkek biweşîne. Ew wextaku pirtûka xwe ya bîranînê “Èşa Hadepê, Jana Amedê” dibe dide weşanvan, helbesta ku di şûna pêşgotinê de nivîsiye bala weşanvan dikşîne, û weşanvan dixwaze ku helbestêن wî yên din ji wek pirtûk biweşîne.

Helbestêن “Nalîna Şevê” kurtayîya èşa ku gelê Kurd û nivîskar bixwe kişandiye tîne zimên. Di van helbestan de bûyerên bi êş ku di Kurdistanê de qewimîn hene. Sîracettîn bi helbestêن xwe şahîdiya bûyerên bi êş dike.

Sîracettîn Kirici jiyana xwe daye xebata politîkî.

Ew têkiliyêner huner, edebiyat û siyasetê baş dizane. Huner û edebiyat ji bo têkoşîna siyasi re katkiyek mezin dikin. Xebatên weha ji bo polîtikayê alîkariyek baş in. Ji bo vê ji divê yên siyasetmedar alîkariya hunermendan bikin. Sîracettîn ji bang dike, dibêje: “Divê piştgiriya hunermendan bête kirin. Ne tenê yên siyasetvan, gelê Kurd bi xwe ji divê piştgiriya hunermendan, edebîyatzaner bike.”

Wek têt zanîn di dema 12'ê Adarê de û paşê ji di dema 12'ê İlönê de hinek mirovên girtî di hepisxaneyen de berhemên edebî afirandin. Hinek ji wan berheman berhemên gelek baş bûn. Berhemên wan li ser hev bi dehan car hate çapkirin. Lî çi heyfe ku vana piştê ku ji hepisxaneyê derketin jiyana xwe ya nivîskariyê nedomandin. Wek berê berhemên baş neafirandin. Gelek nivîskarênu ku di hepisxaneyê de berhem afirandibûn û bûbûn nivîskar, li derve kar û xebata xwe ya hunerî, edebî nedomandin û hatin jîbîtkirin.

Gelek baş e ku Sîracettîn naxwaze bibe ji wan kesan yek. Her çiqas ew bi çavê helbestvanekî li xwe nanêre ji, dîsa dibêje ku di dema pêşte ew dê bi pirtûkek helbestan derkeve pêşberê xwendevanan. Mizgîniyek wî ji bo xwendevanan ev e ku; ew li ser romanek dixebeit. Ew dixwaze romana şoressgerekî Kurd binivîse. Kovara Helwest ji bo vê xebata wî ya hêja wî pîroz dike û jê re serketin dixwaze. Kovara Helwest bangê xwendevanê Kurd dike ku; ew li ser van herdu berhemên hêja nivîsîn analîzê binivîsinin û ji kovara Helwestê re bişînin. Di vê nivîsa jor de me tenê van herdu berhemên edebî da danasînê. Divê li ser wan nivîsîn analîzî ji bêne weşandin. Rûpelênu kovara Helwestê ji nivîsîn weha re her tim vekirîye.

Kovara Helwest

BERXWEDANA 1984AN

Ü

KUŞTINA NECMEDİN BUYUKKAYA

- 1 -

Laleş Qaso

"Birayên me ên misilman" zalmö in!

Wek tê zanîn, li Tirkiyê cûnta tirkên misilman di diwanzdehê ûlona sala 1980î de hate ser hikim. Bi hatina vê cûntayê re li girtîgehanê Kurdistanê û Tirkiyê, wahşeta ku leşkerên tirkên misilman heta niha kiriye, bi gotin û nivîsandinê bawer nakim ku tu kes bikaribe biqedîne! Ji wargehêن Hîtler û vir de mirov dikare bibêje ku zindana Diyarbekirê ji, ji terefê wahşeta "bira misilmanen tirk" bi qasî zindanen Mûsilê, Emnulama Iraqê, zindana Saygonê û zindana Sedmûrê a li Sûriyê bi nav û deng e!

Zaroyê teresan bi kîf û seyranan li ser termêñ kurd pir gevizîn. Li ser termêñ kurd dîsa demekê bilind bûn; kuştin, bi darvekirin, belav kirin, gelek tiştêñ ku dixwestin bi karanîn û bi destxistin. Pêşengêñ kurd çira civakê ên kuştin, ên ku girt û xistin zindanan, ên bi derveyî welêt de terqandin; dil dan ber gwîzêñ û dîlim dîlim kirin. Ewrekî reş û tarî pir giran ji welatê tirk xwe dadabû ser Kurdistanê; xwînê li kolan û kuçan kelax digindirand! hewar hewara dayik û bavan bû! Xwezikha heba ew roja "Haşer û mahşerê" da van "bira misilmanan" em kurd li wir ji, dîsa ser-serkî daliqandibana. Belkî wî çaxî hişê mebihata serê me û em ji "tewekeltûellelah" an, selewat û tekbiran êdî xelas bûbana. Çimkî ji "axretê" wir de tu axret ne dima. Kî dizane, wî çaxî ji belkî bi havayekî din em kurd dîsa bixapandana! Hey hewar ji destê vê misilmantiya bi tirkî, erebî û farisî!

Cûnta li Tirkiyê, taybetî di girtîgehan de, çerxa wahşetê zîvirand; li Kurdistanê ev çerx wek babelîskê zîvirandin. Wahşet, di girtîgeha Diyarbekirê de giha bandevê! Li girtîgehê û li derveyî girtîgehê tiştê ku hate kirin, bi nav qetilameke civakî bû! Bi hezaran kesen demokrat, welatparêz, reşenbûr û hwd. bûn bi qurbana vê wahşetê!

Taybetî li girtîgeha Diyarbekirê li ser girtiyan gelek babetenê eşkencêyê nûder hatin ceribandin. Girtîgeh kiribûn labratowara eşkencê û quesabxan e. Ev eşkence neku li ser gora kîfa karbideştekî an fermandarekî an bêsedem, kîfa wan wilo dixwest dikirin na; hertiş bi zaneti û bi program û di emirê general û MîTa tirk de dihate kirin. General û MîTa tirk bi sedan mirovên kurd û tirk di eşkencexane û zindanan de kuştin; bi sedan mirov kuştin û winda kirin; bi hezaran mirov seqet û şêt kirin. Cîvaka kurd û tirk gelek tiştêñ ku ji girtîgehan hîn bibin hene. Girtîgeha Diyarbekirê ji bo kesen nivîskar, hunermend, doktor, lêkolîner û hwd. xezînek dewlemend e. Mirov çawa dikaribû li ber wê wahşeta Mehmetçikêñ misilman debar bikira! Sê, çar, pênc rojan bêav, bi salan birşî û tazî û li ber serma û germa dijwar herwiha lêdanê bixwe; dujî bimîne, tije sipî bibe; bêxewî, cih tabût, nepaqîji û hwd. lêkolînek pir giřing e!

Di vê qetilama civakî de tu kurd nîne ku birîn ne sitendibe. Bi sed hezaran kurd xistin girtîgeh û zindanan. Ên ku nanîn eşkencexanan ji di mala wî de, di gund û bajarê wî de pê eşkence kirin. Li ser bênderan, di kolan û kuçan de, di newalan de,

li çiyê, li nav daristanê, birin nav goristanan, li ser rîyan wilo heşkere pê êşkence kîrin. Termêñ kurd bi daran ve deh roj-bîst roj daliqandî man; kuştin û avêtin çeman, xîstin binê lat û rîzdêñ zinaran, avêtin nav mayinan cendekê kurd! Gelek kuştin û ewqasî ji seqet kîrin, bêhejmar zikê jîn û keçen kurd talan kîrin; jînêñ kurd di êşkencexanan de, li ser rîyên girtîgehan beravêtin! Zarokêñ kurd di girtîgehan de bûn xort, bav û bapîr di zindan û êşkencexanan de mirin! Bi hezaran çavê dayik û bav û bapîran li rîya girtîgehan herwiha vekirî man û bi hesreta dîtina lawêñ xwe mirin! Bi sedan dergûşêñ kurd di himbêza dayikan de li ser rîyên girtîgehan di nav lapûşkê germa havîn û serma zivistanê de can dan! Erê, bav û bapîr, dayik û xuşkan li ber deriyê girtîgeha Diyarbekirê ji destêñ polis û leşkerên tîrk hindik lêdan nexwarin! Pir pir qêriyan û kîrin hewar! Li hewşa girtîgehê keç û jînêñ kurd li ser berfa zivistanê di gevizandin; bi guliyêñ wan digirtin bi dû xwe de dîkişîşandin û bi jop û daran, bi pêñ û kulman diketin ser zikê wan! Digiriyan, diqêriyan, dikirin hewar û li sênga xwe dixistin! Belê ci bikim ax hewar, namûs û şerefa cihanê qet ew his nedikir! Pevçûn! Ji pevçûnê pê de tiştek di destê me de ne maye! Herçi mîrê misilman e ji devê tivingê pêve tiştekî fêm nake. Îcar ku ev misilman tîrk, erek û faris be ji xwe hîç hîç fêm nake! Rêexistinêñ kurdêñ bakur ji devê ketine hophop ji wan tê. Tîrkan em û ew di terefê dînyayê re derxistinê, û tew hîn ji behsa "demokrasî, însan hakları, barişçıl hava içerisinde huzura kavuşmak" û hwd. dikin. Me kurdan gotinek heye dibéjin," Kero nemire heta ku qîvar şînbê" Texsîr mekin. Bêhna xwe fireh bikin, hema hema hindik maye ku tîrk bi mîletî bibin însan!

Li girtîgeha Diyarbekirê bi hawayê siyâsi tarîxa destpêka berxwedanê, 2.1.1981 e. Di vê tarîxê de temamê girtiyan besdarî greva birçîbûnê bûn. Belê mixabin girtiyan bêku tiştekî bi destxin, grev di diwazdehê vê mehê de qedandin. Tarîxa rojiyamirinê ji 4.1.1981 e. Di vê tarîxê de diwazdeh mirovan, bi sedema ku hem li girtîgehê êşkence rabe û hem ji girtî li dadgehê bikaribin siyâsi biaxîvin, dest bi rojiyamirinê kîrin. Ev kes besdarî rojiyamirinê bûbûn:

1. Hayrî Dûrmûş. Bîngolî bû.
2. Kemal Pîr. Laz bû.
3. Zekî Yilmaz. Laz bû.
4. M. Şener. Batmanî bû.
5. Alî Erek. Ruhayî bû.
6. Orhan Aydin. Bîngolî bû.

7. Celaledîn Delîbaş. Ruhayî bû.
8. Mûzaffer Ayeta. Ruhayî bû.
9. Mustafa Çepîk. Ruhayî bû.
10. Yilmaz Üzûn. Ruhayî bû.
11. Ahmet Serîn. Xerpûti bû.
12. Riza Altin. Ji kurdêñ dorhêla Enquerê bû.

Berxwedana îlonê, politîka dewletê a li girtîgehê bi guhertin dabû. Berxwedan gihabû armanca xwe. Bi dû vê berxwedanê de herçendî berxwedanek wek vê mezin û bi xwîn li dar ketibe ji, dewletê dîsa hertiş li gor programa îlonê bi kâraniye û bi wê programê heta roja îro meşiyaye. Bi berxwedana îlonê rewşa girtîgehê hinekî xweş bûbû. Girtiyan, mirovîn ku desthilatiya girtîgehê li qawîşan ew kiribûn mîr û amîr ji meqam kîrin; di şûna van mîr û amîran de bi hawayekî demokratîk hin mirovîn tekoşer û zana berpirsiyar râkirin. Derveyî berpirsiyarê qawîşan bi navê nûnerên girtîgehê sê nûner hilbijartîn û têkiliyên xwe bi carekê ve ji desthilatiya girtîgehê qut kîrin. Nûneran rêberiya hemû tişti dikirin.

Qewlê ziyaretê ji deqîqeyekê derxistin pazndeh deqîqan.

Berxwedana îlonê di exlaqê dadgeran de ji hinek guhertin kiribû. Dadgerên pêxwas, wek berê bi girtiyan re zirzopkî nema axivîn; mîna ku bi rastî bêteref bûn durvekî wilo dan xwe û li girtiyan guhdar kîrin.

Berxwedanê qedexekirina li ser xwe parastina siyâsi rakiribû. Bi sedan mirovan doza kurd parast û axaftinêñ xwe derbasî ewraqan kîrin.

Berxwedanê werger derbasî hindurê dadgehê kiribû. Kurdêñ ku nizanîbûn bi tîrkî, bi kurdî serbest axivîn û ji dadgeran re zilma dewletê rave kîrin.

Berxwedanê qedexekirina li ser çûna qedemgehê ji rakiribû. Çûna qedemgehê şertek ji ên berxwedanê bû. Rêberên berxwedanê bi generalan re li ser vê yekê ji axivîbûn.

Di her du, sê salêñ teslîmiyetê de, li girtîgehê hemû rêexistinêñ kurd ji hev feşkilîbûn. Hin mirovîn rêvebir ketibûn tolaqa canê xwe; dev ji kerî berdabûn tenê li xelaskirina xwe digeriyan. Berxwedana îlonê ev berîberdaniya ha ji rakiribû. Rêvebiran, alîgir li dor xwe civandibûn û bi hawayekî rêexistinî keftûlept dikirin. Di vê demê de rêvebirên PKKê rêexistina xwe a girtîgehê ji 30 kesî saz kiribûn. Û van 30 kesan ji di nav xwe de

ev kes serok hilbijartibûn: Mustefa Karasu, M. Şener, Muzaffer Ayeta, Riza Altın û Orhan Aydin. Girtî di bin serokatiya van pênc kesan de besdarî berxwedana sala 1984an bûne.

Berxwedana sala 1984an:

Desthilatiya girtîgehê di duduyê çilê sala 1984an de bi dêr, gitte devê deriyê qawîşan û dest bi lêdanê kir. Bi vê lêdanê re herçendî desthilatiya girtîgehê, "Cilên mahkûman li xwe bikin emê lêdanê rakin..." gotibe jî, dîsa derew kiriye. Armanca dewletê êşkence û lêdan bû; bi vê êşkencê û lêdanê hin mirovan bikujin, girtî ji desthilanîn bikevin ku dîsa hertiş bihatâ sêra berê. Derew dikirin dibêjîm, ji ber ku di hindurê dema berxwedanê de mirovên ku bi lêdanê cil li xwe dikirin ji ên ku hîn cil li xwe ne kiribûn bêtir êşkence didîtin. Di hindurê du mehan de nêzîki sêsed mirovî bi lêdanê teslîm dibe û Mehmetçik jî mîna berê her tiştî li van mirovan qedexe dike. Ev mirov digel ku dibêjîn, "Biji Atatirk! Biji leşkerên tirk! Em kûcik em kûcik! Me gû xwar! Hûn çawa bixwazin emê wilo bikin..." dîsa jî êşkenca herî giran dibînin. Kurdo xwe ji Mehmet re dikir kûcik, belê ev kûçkanî wê dîsa jî fêde neke. Girîng e ev! Rêexistinê me ên ku "Bariş içerisinde kîbarca huzûra kavuşmak..." dibêjîn, gerek baş li ser vê yekê bisekinin.

Desthilatiya girtîgehê bi destpêka lêdanê re tam pênc rojan xwarin ji ser girtiyan qut kir û di van her pênc rojan de bi sedan komando ji kolordiya Diyarbekirê anîn girtîgehê. Komandoyan xwe dadan hindurê qawîşan û bi lêdaneke pir pîs kişiyan ser zikê hêşîran. Serkêşen berxwedanê jî li himber vê êşkenca komandoyan hebitîn; xwe bêçare dîtin û dest bi dana biryarên çewt kirin. Van serkêşan mîna zarokan, her ji bêhnikêkê tiştîk gotin û girtî bi vir de û wir de ajotin. Biryar hemû ji terefê rêexistina PKKê dihate dan. Serkêşen vê rêexistinê li qawîşen piçûk ji sê û li qawîşen mezîn ji pênc kesan komîte dameziran din. Ü komîte bi xwe ve girêdan. Komîte jî bi giştî ji mirovên tirsonek û berdoşekciyên serokan hatibûn pê. Di van komîtan de ji hemû rêexistinan mirov hebûn. Serkêşen berxwedanê M. Şener li qawîşa 24an, Orhan Aydin, M. Karasu, Muzaffer Ayeta û Riza Altın jî li qawîşa 35an bûn. Komandoyan yefş nedan girtiyan; bi şev û roj êrîş kirin qawîşan û di hindurê qawîşan de serî, zend, çîm û rihnên hêşîran şikenandin. Bi vê wahşeta komandoyan îcar rêvebirêne me jî, wê jî qudûm bikevin û

habela berevajî bîryaran bidin. Hêşîran li ser gotina wan, kîncêñ mahkûman li xwe kirine. Van mirovan ji girtiyan re pêşî gotin;

"Gava komandoyan di hindurê qawîşê de li we xist, hûn jî li wan xînin. Û gava hûn bi darê zorê birin salona sînemê, îcar tenê sloganan bavêjin û hew."

Di pey ku girtiyan di hindurê qawîşan de bersiva komandoyan bi lêdanê dan û komandoyan jî dest bi şikenandina parsuyan, zend û çîm û rihnan kirin, îcar serokan wiha emir dan:



"Deriyê qawîşan asê bikin û bi hawayê artêşkî xwe saz bikin..."

Berdevkêñ berxwedanê li ser gotina serokêñ berxwedanê em girtî li hev civandin û em bi hawayê artêşkî saz kirin. Di van rojêñ ku em bûbûn arteş, ez jî li qawîşa 34an bûm. Di vê demê de qawîşa herî mezîn ev qawîş bû. Serhejmara me li dor 200 kesî hebû. Çawa kirin binerin?:

Li ser emirê berdevkan girtî rapelikîn textên xwe ên razanê bûn û ji van textan şûr, mirtal, rim û debûz çekirin. Hinekan têl û şîş jî peyde kiribûn. Artêşa bêtir û kevan ne dibû me ne ji xwe (!) Tîr û kevan jî çekirin. Bi dû ku em hemû bûn bi xwedî çek, berdevkan jî bi hawayê artêşkî em ji hev cihê kirin. Hin ji me kirin borîzancî, hin kirin bandocî, hin kirin bombecî, hin kirin mirîkêş, hin kirin pêşmîr û paşmîr, çawîş û başçawîş, teymen û usteymen û general ji me çêkirin û em bi ser cephê de ajotin. Artêşa tîr sê carî êrîş anîye

ser cephê me û di her sê caran de ji me ew şerpeze kiriye(!) Gava ku komandoyên tirk hildikişyan ser banê girtîgehê, ji hindama şibakan êrîş tanîn me û bi xurtûma terempêla agirvemîrinê av dipiji-qandin ser me, ji her kesî bêtir tade li borîzanciyen dihat. Borîzan ji kaxetê, qederê bi-hustekê fireh û metroyekê ji dirêj çêkiribûn. Borîzanciyen heta ku komandoyan ji hewa de av ne pijiqandina ser cephe, bi rastî ji dil û can û pir xweş li borîzanê dixistin. Ku komandoyan av dipijiqand û borîzan şil dibûn, îcar borîzanciyen me hemû wê li wê navê repikî rawestiyana û dest bi qîj û qîr û fikandinê kiribana. Di artêşa me de ji bili şêfê bando û borîzanciyen, her kesî li hev dikir. Gava ku borîzanciyen difikand, şef ji wê xwe aciz bikira û bigota;

"Yaho ez nema zanim bê beroş, qelpax û sêniya min ci dibêje. Li gora meqamê beroşê qîja bidin, li gora meqamê qelpax û sêniyan bifîkînin haho we ez teqandim!.."

Bi rastî ji me dengekî pir ecêb derdixist! Şef rast digot. Şef xwe biçiranda ji heqê wî bû.

Di vê artêşe de wezîfa min ji yek jê ku ez derketi-bama şibakan û bi kurdî min şihîr bixwendana. Ü yek ji gava komandoyan bombeyên mijê bavêtana hindurê qawîşê bi destmaleke şil, minê xwe bavêta ser vê bombê û bombe dîsa bavêta der. Bombegirtên qawîşê em şes kes bûn. Heft kes ji saroxçî hebûn. Saroxçiyen çewalê pîvazan, sabûn, tûrsîl û mîntaksê danîbûn ber xwe û di şibakan re davêtin komandoyan. Serokên berxwedanê girtî kiribûn wek zarokan. Wilo ketibû serê hin girtiy-an ku bi rastî wê bi darik û marik û pîvazên didest xwe de, bikarîbana bi top û teng û bale-fîren tirk re derxin serî. Hin girtiyan gava ku di-gotin:

"Lawo ev ci aqil e! Bi asêkirina van deriyan me tiştekî baş ne kiriye. Deriyan vekin. Em deriyan asê bikin ewê di şibakan re bê; em şibakan asê bikin ewê diwêr quł bikin û têkevin hindur. Îcar eger me ne hişt di qulan re ji bêñ hindur, wî çaxî ji wê qawîşê bombe bikin û me hemiyan bikujin. Misilman zalim in! Wilo mekin. Dev ji vî aqılı berdin. Em mirov in hêşîr in. Wezîfa Mehmetçik ku êşkencê bi kurdo bike û wezîfa kurdo ji ku bi sloganan, greva birçîbûnê û rojiyamîrinê berxwedanê bikin..."

Serok û berdevkên serokan xwe sil dikirin û digotin:

"Hûn bi van gotinê bizdokî û serqotkî hevalan ji moral dixînin. Van rexneyên xwe ên beredayî qut bikin. Em niha di şer de ne (!) Mirov di hingama şer de rexnan nake, guh dide serokatiyê û dîmeşe. Pişti ku şer qediya, êdî wî çaxî hûn dikarin rexneyên xwe bibêjin ewqas."



Hemû partiyên kominîst dîktator in. Îcar partiya kominîstên ku ji beqal û şeqal û gundiyan hatibe pê, ji dîktatoriye ji hîn bi wirtir de ye. Mirovê beqal ji bo çend qurûşan qezenc bike beqaliyê dike. Gava te ev mirov kire mîr û amîr, berî her tişti wê bi sextekariye dakeve. Karekterekî wî i rûnişti tuneye. Pêşî wê bixwaze ku dewlemend bibe. Ewê welatê xwe wek dikana beqêl û insanên xwe ji wek nok û qidaman bibîne û bifroşê. Mirovê beqal, şivan û gundî nikarin bibin sermyanên welatan. Gava te ew kirin sermyan, wê dest bavêjin dêr, bifîkînin û bang te bikin. Di pey ku wê te bi lêdanê bikin helawa Mêrdînê îcar wê li xwe vegerin û serê hev bipelixînin. Gundî xwedî xwe û wilo karekter in. Çenabe ku mirov ji van mirovan, partiyên kominîst saz bike. Hem kominîstî di şertê welatê me de ji xwe tiştekî kilêt e! Îcar gava ku me gundî û beqalan bi hawayê kominîstî rahişt doza kurd, tam wê bibe firdik. Ji xwe re li halê kurd binerin bê me kominîstên gundî ci bi serê xwe û welêt de aniye. Kominîst nikarin tîrsonek, bêbext û bêşexsiyet bibin, belê ji ber ku em gundî-kominîst in em dikarin bibin tîrsonekê herî mezin, teşqelçî û durû.

Dûmahîk heye

HÊSÎR IM DAYÊ NE GIRTÎ ME

Seracettîn Kirici

Sal 1981

Sar serma û seqem
Bêdengî û ewrên radeştiyê
Li ser girtîgeha Amedê kombûne
Û ez hesîr im dayê ne girtî me

Bê ziman
Bê welat
Bê evîn im
Pênc hezar girtiyêñ Kurd hinek Tirk û Ereb
in
Û dibin potînêñ neyaran de
di bin ranzan de dinalin
Hêsîr im dayê
Ne girtî me

Taçtiya me
Bi sed jopî û çav bi werm in
Firavîna me
Mişkêñ bi saxî û qalkêñ zebeş in
Şîva me
Bi mil şikestî û nenûkêñ bi xwîn in
Paşîva me
Di xew de pihin xwar û diran şikestî me
Hêsîr im dayê
Ne girtî me

Dersdarêñ me
Dersdarêñ totikvala dibêñ ku
“Kurd Tirkê çiyayî ne û navê wan ji kart
kûrtê hatiye”

Tê bibê

Dibe ma lawo, em Kurd in
Erê dayê erê ez Kurd im
Ez Kurdekî neviyê Ahmedê Xanê
Ez Kurdekî neviyê Şêx seidê kal im.
Lê aniha ez stuxwar
Lê ez pepûk û ez di sinifê de mame
Hêsîr im dayê
Ne girtî me

Neyar dibêñ
Vira ne girtîgeh, dibistan e
Erê dayê erê vira dibistan e
Lê ne dibistana ilim û zanyariyê ye
vira dibistana ixanetê
dibistana işkencê
dibistana lêdanê û tije xwîn e
Hêsîr im dayê
Ne girtî me
Rojê deh saetan
li ser linga me
Hevalêñ girtî
Xortêñ ciwan rojê du saetan serî di laximê de
Bi jana zirav
Bêbijişk û bêderman in
Hêsîr im dayê
Ne girtî me

Çi daraz
parêzger
û çi jî dadgeh

Bêferman dest kelepçekirî bizencîr im
û ev çend sal e ez bêzar û dilwêran im
Hêşîr im dayê
Ne girtî me

Rojêñ

Havînê hesretiya
Qedehek av
bênan
bêçay
û kula mezin
bêtûtin im
Hêşîr im dayê
Ne girtî me

Bihna laşen şewitî
Qîrîna
Zarokên gulan û newrozê
Guhê min diçingine
Lê ez ker
ez lal im
Hêşîr im dayê
Ne girtî me

Sal

1983
meha Îlonê ye
Dengê xortêñ Kurda
ji çel qawîşî
Teva asîmanêñ sayî dibe
û ewrêñ li ser girtîgeha Amedê
ewrêñ rûreşiyê
ewrêñ radêstiye
yek bi yek bela dibin
û ez
Girtî me dayê
Ne kole me

Dengê
xortêñ Kurda
bi dehan

bi sedan bi hezaran
dimeşin ser zordestiyê
ser neheqiyê
û zincîrêñ koletiyê dişkînîn
Girtî me dayê
Ne kole me

U em

Tekoşerêñ evîna xwe
em
Tekoşerêñ welatê xwe
Tekoşerêñ azadiyê ne
Girtî me dayê
Ne kole me

Dijmin
Bi dijwarî tê ser min
xortêñ ciwan
xortêñ şoreşger
û zarokêñ azadiyê şiyarbûne
li hember êrişen neyaran
Bi berxwedanê
Bi rojiya mirinê serbilindin
Girtî me dayê
Ne kole me

Dozgerê
Şehîdêñ Amedê
Dozgerê
Şehîdêñ azadiyê
Dozgerê
Şehîdêñ Aşîtiyê
û ez girtiyekî Kurd im
Girtî me dayê
Ne kole me

Têbinî: Ev helbest ji pirtûka Seracettîn Kirici
“Nalîna Şevê” hate wergirtin.

BÊ NAV Û NÎŞAN MAN

Du helbestêñ Kurdi

BÊ NAV Û NÎŞAN MAN

Bê nav û nîşan man şevêñ me
Hîv û rojêñ me jî.
Xwezîyêñ me
Li ezmana bune rêz
Di bin ewrêñ reş de
Xwe li dora rojê pêçane;
Li benda rojêñ biharê
Mîna dendika qaranfîla sor
Di bin berfê de.
Mîna tu li benda min,
û ez li benda te.

Lezgîn Saleh

GUL BIŞKIVî

Ev gul bişkivî nika bêhn bikim
Dil ser digrî me çav hêstêr dikim
Li rê dinêrim dewsa nas dikim

Ev gule jînê tehrda nav xwînê
Belgê bihara zer diweşîne
Havîn tê agir ser dikelînê
Pahîz diburê wê peyda nakim

Li pey dikevîm ji min direvê
Pêşî yê digrim nakevê qefê
Zivistan ewre roj nadê tavê
Gulşenga min ka dil pê şabikim

Dibim wek Memê ew nabê Zînê
Çar danê salê ser dikim şînê
Axêñ ji destê vê gul evînê
Dest neda min çu li kê hewar kim

Dil dibim kuvan ser gula ciwan
Eve sipehiya gulên tev cîhan
Ji bo min tenê ew nebû jîyan
Li Kurdistanê dil pê derman kim

Ji evîna xwe ev dilê min mîht
Seb qelenê xwe her xwîna min rîht
Loma îro ez ser bume dilpêt
Li vê dinya yê bê hedar nakim

Dilpêt Jêlî

bi

Mehmed Uzun re

Kovara HELWEST'ê xwe daye ser riyekî baş; riya danasîn û rexnegiriya berhemên niviskarê kurd. Di vî warî de valahiyeke mezin heye. Kovara we gaveke baş, di vî warî de avetiye. Ez hevî dikim ku hûn ê bikaribin vê gavê, bi gavê nû temam bikin. Analiz, rexne û lêhurbûna berhemên edebî zahf pêwist in. Bêyî van pêşketin ne mimkin e.


Kovara Helwest - Pirs: 1 — Te kengê, çawan û çima dest bi nivîskariyê kir? Tu ji bo çi û ji kî re dinivîsîni?

Mehmed Uzun - Destpêka salên 1980-an min dest bi nivîskariyê kir. Beriya wan salan jî min dinivîsî, lê mîna rojnamevan. Bi salên 1980-an, min dest bi nivisandina romanê kir. Romana min a yekemîn TU sala 1985-an weşıya.

Çima? Jiber ku bala min li ser edebiyatê bû û min dil hebû bi kurdî romanek binivîsa. Meydana siyasetê, bi têra xwe, tijî bû, lê meydana edebiyatê, nemaze meydana romana kurdî, hema çi bigire vala bû. Çima roman? Jiber ku roman meydana herî fireh, bikêr, dirêj û kûr a edebiyatê ye. Ji bo pêşxistin û nûkîrina zimanekî, ji bo avakirina trasdisyoneke edebî, roman, hunera romanê, gelekî baş e. Zimanê kurdî hewcedarê romanê bû, hê jî hewcedarê romanê ye.

Xwendevanê min, bêguman, berî her kesî kurd in. Rast e, xwendevanê kurd, nemaze yên romanê, gelekî kêm in, lê ev yeka nexwêş naye wê manê ku ew ê neyên pê. Lê romana kurdî divê bibe perçeyekî romana cîhanê jî. Nivîskarê kurd divê bi vê hest û baweriyê binivîse.

Kovara Helwest - Pirs: 2 — Tu rewşa edebiyata Kurdî ya nivîskî çawan dibîni? Başî û kîmasî ci ne û ji bo çêtirkirinê ci divê?



Mehmed Uzun

Mehmed Uzun- Rewşa edebiyata kurdî ne baş e. Kes nikare bibêje baş e. Sebeb jî diyar in. Ne hewce ye ku ez sebeban, yek bi yek, li vir nîşan bidim. Lê eger meriv bixwaze di nav vê derya nebaşiyê de hin pêlên baş bibîne, hingî meriv dikare bibêje ku hingavê hêja, di nav van panzde-bist salên dawîn de hatine avêtin. Kurdan, iro, dest pêkirine û roman dinivisîn, hunereke bedew a romanê ava diquin. Şihira modern tê nivisîn. Piyes, ceribandin tê nivisîn. Nîvîskarê

mîna Naci Kutlay, Hesenê Metê, Lokman Polat, M.Alî Kut, Riza Çolpan, Medenî Ferho, Mustafa Aydogan, Suleyman Demir, Bûbê Eser, Helîm Yûsif, Xurşîd Mirzengî, Mihemed Dehsuwar û yên din ku niha navê wan nayê bîra min derketine. Ez ji van hevalan gelekî hêvîdar im. Ez bawer im ku ev heval û navên nû yên mîna van hevalan ê bikaribin eser û berhemenê giranbiha diyarı kitabxana kurdî ya neçar bikin.

Kêmanî gelek in , bêhejmar in. Lî bi nivisîn, afirandin û derxistina berheman ve, kêmanî dê kêmter bin. Bêyî eser û berheman kêmanî kem nabe. Çare afirandin e, bi şêweyeke profesyonel xebat e.

Kovara Helwest - Pirs : 3 — Nasnameya berhemek zimanê wê ye, yan naveroka wê ye?


Mehmed Uzun- Ziman e. Ziman, aidiyet e. Ziman ne bi tenê ruhê gel û miletan, herweha ruhê edebiyatê ye jî.



Kovara Helwest - Pirs : 4 — Romana Kurdî çawan dikare pêş bikeve?

Mehmed Uzun - Pêşketi jî bi nivisandinê dibe. Divê ku hejmara kesên ku dînîvisin, zêde be, niviskar zêde be, berhemên wan zêde bibe, romana kurdî zêde bibe. Eger weha be, ez bawer im, kurd ê bikaribin, di demeke kurt de, gaven gelekî mezin, di warê romane de bavêjin. Jiber ku

romana kurdî, bi firehî, hê nehatiye nivisîn. Tişt, bûyer, babet û pêwendiyênu ku niviskarênu kurd dikari binivisin, behejmar in. Jiyana her kurdeki romanekê bêpayan e, lî nivisîna vê divê, lihevânîn, huner, teknîk û zimanekî edebî ya vê jiyanê divê.



Berga pirtûka 'Evdalê Zeynikê'

Roman û nivisîna romanê, meriv dikare bibêje, şaxê herî dijwar a edebiyatê ye. Jê re ked, xebat û zanîneke kûr, sebireke têkûz, nefeseke drêj divê. Kurd hê hînî vê yekê nebûne, lî gava dest pe bikin û niviskariyê bikin celeba jiyanê, hingî ew ê romanen gelek balkêş, hem ji bo kurdan, hem jî ji bo hemû cîhane binivisin.

Kovara Helwest - Pirs : 5 — Tu berhemên niviskarênu Kurd yêñ nûh (yêñ ku xwerû bi Kurdi dînîvisînin) çawan dinirxînî?

Mehmed Uzun - Bêguman ez nikarim, li vir, berhemên niviskarênu nû, yek bi yek, binirxînim. Lî eger ez bi giştî bibêjim, ez piştgirtiya xebata wan a nivisin û afirandinê dikim. Xebata wan eserên wan pîroz in. Ez dizanim, tevî zehmetiyêni bêhejmar wan ev berhemên xwe anîne pê. Bêyî alîkarî û teşwîkê, bêyî îmkanîn çandî, edebî,aborî û civakî. Ez wan pîroz dikim.

Eserên ku wan anîne pê, bêşik, berhemê wan ên destpêkê ne, kêmanî şasî û çewtiyên wan, bivê nevê, hene. Lê ev ne xem e. Kêmanî, şasî û çewtî dikare, bi xebat û afirandinê ji holê rabe, lê bêkeysî, bêkêrî, stêwrî nikare, bi gotin û xireciran, ji holê rabe. Van hevalên me yên nû xwe dane ser riyeke pîroz. Bêlê riyeke hêja û tijî rûmet, bêguman, di eynî wextê de gelekî çetin. Lê rûmeta afirandina berhemeke kurdî ji hemû malê cîhanê hêjatir e.

Kovara Helwest - Pirs : 6 — Tu berhemên kîjan nivîskarê cîhanê û yên Kurdan hez diki, kî tesîra xwe li ser te kiriye û kîjanî nêzî xwe dibînî?

Mehmed Uzun - Jiyana min di nav kitab û romana de derbas dibe, doraliyên min tijî niviskar in. Xwendin, karê min e. Ez her celeb, her texlît nivîskarî dixwînim. Nivîskarênu ku rewşa wan jî bi ya kurdan dişibe, li ber dilê min gelekî ezîz in. Mesela nivîskarênu welatên totalîter ku li hember totalîteriye radiwestin, nivîskarênu welatên Amerika Latînî û Afrîkayê, gelekî balkêş in. Herweha ji Homeros heta Tolstoy, nivîskarênu klasîk ku hertim riya însan û însaniyetê ronî dikan, gelekî girîng in. Destan jî her welê, Gilgamiş, destanê Rojhelata navîn, destanê zimanê cîran û yên me kurdan. Ev jî gelekî esasi ne. Çi mixabin e ku ez di warê romanê de nikarim navekî bibêjim ku tesîr li min kiribe. Jixwe romanen kurdî bi tiliyan têñ hejmartin. Min ew xwendine, lê ez bi tesîreke wan a diyar nehesiyame.

Kovara Helwest - Pirs: 7 — Tu niha li ser ci dixe-bitî? Planen te yên pêşerojê ci ne?

Mehmed Uzun - Ez niha li ser romanekê nû dixe-bitim; Ronî mîna evînê - Tarî mîna mirinê. Ev bûye çendeke dirêj ku ez li ser vê romanê dixe-bitim. Roman niha li ber xelasbûne ye. Li milekî din, min ceribandineke nû ya gelekî dirêj ku çêla dengbêjan û hunera dengbêjiyê dike, nivisîye. Ew

jî niha, ji bo halê xwe yên dawîn, xwe dixemilîne.

Kovara Helwest - Pirs : 8 — Ji bo pêşveçûna çand, edebiyat û zimanê Kurdî rola kovarênu xwerû bi Kurdî ci ye?

Mehmed Uzun - Bêguman rola kovaran bêpayan e. Heta kovarênu xwerû kurdî nebin, ne ziman dikare pêşve bikeve û xwe nû bike, ne jî edebiyat û çand. Kovar, dest û piyêñ edebiyat û berhemên edebî ne. Kursiya bir û baweriyên cihê, eser û berhemên têkel in. Kovarênu kurdî dê xwendevanen kurdî ava bikin, eseran bi xwendevanan bigîhînin, qedr û rûmeta wan derxin pêş û wan binixinin. Bêyî kovar û rojnameyan tu pêşketin, tu pêwendî di navbara nivîskar û xwendevanan de nayê pê. Bi baweriya min sê stûnên bingehîn ên jiyanekê geş a edebiyatê hene; nivîskar, kovarrojname û xwendevan. Kovar û rojname - herweha rexne û rexnegirî - pir in, ew nivîskar û berhemê niviskaran vediguhezînin xwendevanan. Ji lewre, kovarênu kurdî gelekî biqîmet in. Em divê wan mîna çavê xwe biparêzin, li wan xwedî derkevin û alîkariya wan bikin.

Kovara Helwest - Pirs : 9 - Pirsa me ya dawî jî ev e: Ji bo kovara Helwestê dîtin, û pêşniyazên te ci ne?
Kovara Helwest giranî bide ser kîjan babeti?

Mehmed Uzun - Kovara HELWEST'ê xwe daye ser riyeke gelekî baş; riya danasîn û rexnegiriya berhemên nivîskarênu kurd. Di vî warî de valahiyekê mezin heye. Kovara we gaveke baş, di vî warî de avetiye. Ez hevî dikim ku hûn ê bikaribin vê gavê, bi gavê nû temam bikin. Analiz, rexne û lêhurbûna berhemên edebî zahf pêwist in. Bêyî van pêşketin ne mimkin e.

Ji bo bersîvîn te em sipas dikan. Rûpelên kovara Helwestê her tim ji te re vekiriye.

Mehmed Uzun - Ez jî spas dikim û umrekî dirêj ji bo kovara we dixwazim. Hûn her bijîn.

GIRÎNGIYA DENGBEJIYÊ

Di "ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNİKÊ" DE



Merwan Yilmaz

Di vê dema dawiyê de romanek bi navê "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" derket. Ev roman "ji aliye Weşanên Welat û Dozê ve li Stockholmê û li Stambûlê hatiye weşandin. Roman 163 rûpel e. Nivîskarê wê Mehmed Uzun e. Wî hemû romanên xwe li sûrgûnê nivîsîne, ew nivîskarekî sûrgûnê ye. Di vî warî de ew wisan dibêje: "Sûrgûn hem dikare mirovan bikuje, hem jî bi pêş bixe"

Weke dihê zanîn, sûrgûn ji bo wî bûye wêjexaneya kurdî û cîhê afirandinan. Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê romaneke allegorî ye. Wî bi vê romanê, wêjeya devkî û klasîk bi ya nivîskî ve girêdaye. Uzunî bi qayde û awayê wêjeya Mezobotamî ya kevn, mîna destana Gilgamişê nivîsîye. Eposa Gilgamişê, di derheqa hevaltî û mirinê de ye. Gilgamiş qiralê Urukê bû (bz 2600), navûdengê wî belav bûbû, bûbû wêjeya devkî. Ew qiral bû, lê Evdalê Uzunî dengbêj e, ew ne tenê dengbêjê Kurd e, ew dengbêjê gelan e (di romanê de); Evdalê Zeynikê Uzunî hem dengbêjê Kurd e û hem jî yê Ermenî û Suryaniyan e. Em bi xwendina vê romanê, dîroka kilam û stranên xwe, dildar û evîndarên xwe, wargeh û edetên xwe, başî û xirabiyê xwe hîn dibin.

Mehemed Uzunî bi eşq û evîneke mezin romana "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê" nivîsîye; ji xwe eşq û evîna mezin nebe, romana kurdî nayê nivîsîn. Ev roman mîna "Bîra Qederê" romane-

ke mezin e. Wî di herdu romanên xwe de mirovîn Kurd û jiyana wan dihîne zimanî. Navîn mîna Celadet Bedirxan, zane û ronakbîrekî Kurd e, di "Bîra Qederê" de lehengê sereke ye, Evdalê Zeynikê dengbêj û kilambêjekî binavûdeng e. Celadet Beg bi xebata wêjeyî û nivîsinê ve mijûl dibe, Evdalê Zeynikê, bi kilam, stran, kul, şahî û derdan ve mijûl dibe. Bi alîkariya vê romanê wêjeya devkî milê xwe dide wêjeya klasîk û wê xurtir û saxtir dike. Di romanê de sê evîn hene, ew jî ev in: Evdal û Gulê, Siyabend û Xecê û Bengîn û Meyro, ew sembolên duh, iro û pêşerojê ne.

Di romanên tirkî de Kurd mîna kesên hov, nezan, paşket, bêbext û çiyayı dihêne şirovekirin. Lî di romanên Uzunî de tersî wê... Egîd Beg hevkarê dijmin, bêbext û hîlebaz e. Di vî warî de Uzunî wisan nivîsîye: "Kor Reşîd Paşayê xwînrêj, Egîd Beg jî xiste dewsa Tahar Xanê û ew mîr îlan kir. Herçî Egîd Begê bû, mirovekî zikreş, çavbirçî, ji xwerazî, hayin, sextekar, zalim û hîlebaz", mîna Beko Awanê Mem û Zînê ye". Ew li pey kuştina evîndaran digere, bi alîkariya dijminî derdikeve ser riya Evdal û Gulê û Bengîn û Meyro, ew dixwaze biryaran Osmaniyan bi cîh bîne.

Naveroka "ROJEK JI ROJÊNEVDALÊ ZEYNİKÊ" kom dibe ser van xalan: 1) Hîkarîya Evdalê Zeknikê li ser stran û kilamên kurdî, destanên kurdî û wêjeya klasîk a kurdî; 2) Hestên

mirovane, şerê birakujî; bira li dijî biran; 3) Sê evîn, sê bûyerên evinîyê; 4) Dostî û xîyanet; 5) Zilma Osmaniyan, began; 6) Koçerî û bindestî, rewşa kambax a berê; 7) Bûyer û serboriyêñ dîrokî; 8) Bîr û baweriyêñ duh û iro; 9) Danûstandin bi neteweyêñ cîran re biratî û dostî; Ermén, Suryanî, Keldanî; 10) Ézidî, pîrozgeha wan, "Lâleşê"; 11) Adetêñ kurdî; dawet, ol, rabûn û rûniştandin, mahrbirîn, xelat, keç-xwestin, zewac... Bêbextî û xwefiroşıya Egît romanê bi xwîn û goşt dike, raman û heyecaneke din li romanê zêde dike ew adetêñ kurdî dide bin lingan, rabûn û rûniştandinâ wî li gorî, adet û úsilén Kurdan nîn e, ev tişt bala mezinê Ézidiyan Şêx Xelef dikişîne. Di vî warî de Uzunî wisan nivîsiye:

"Gotina Egît Begê li ser seran û çavan. lê, me û welatê jî adet û úsil hene. Ma Egît Begê bi van adet û úsilan dizane? Ma heger yek here û xwe bavê tor û bextê Egît Begê, ew ê wî zimanî bide bi şûnde? Ma Egît Begê nizane ku Bengîn û Meyro hatine û xwe avêtine ber bextê me, Ézidiyan."

Beriya ku ez vê romanê bixwînim, min pênc roman li dû hev xwendin, yekjê "Ivanhoe", a Sir Walter Scott, a diduyan, "Ana Karanîna" a Tolstoj, a sêhemîn "Odysseus" a Joyce, ya çaremîn "Birayêñ Karamasova Dostojevskij û pêncemîn "Bîra Qederê" ya Mehmed Uzunî" bû. Tam û lezeta van romanen di bin zimanê min de bû, min dest bi xwendina romana "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" kir, wê ez birim nav cîhana xwe, ez ketim nav kilam, stran, destan, serpêhatî û çîrokêñ kurdî; wan ez girtim û berê min dan Kurdistanê; warê bav û kalan yanî ez bi xêra Evdalê Uzunî" çûm Kurdistanê, min li wir warêñ bav û kalan dîtin, bi heyala dîtinâ pîrozgeha Siyabend û Xecê, ez li ser pişta hespê Siyabendê Silivî; "Bozoyê Rewan" siwar bûm û min berê xwe da serê çiyayê Sîpanê Xeletê; nav goristana destana kurdî ya Siyabend û Xecê; li wir stranbêj, çîrokbej, kilambêj, netewebej, eşbêj, helbestvan û dengbêjan dengen xwe bilind dîkin, bi dengê lorîna Xecê û ez ji xewa giran hişyar bûm, min dît ku ez ji Kurdistanê dûr, li Swêdê dijîm, lê bi cîhana romanê, bi xêra Evdalê Uzunî, ez vege riyabûm welatê xwe, min berê xwe dabû war û wargehêñ bav û kalan.

Mehmed Uzun bi romana "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" duh bi iro ve girêdide û iro bi pêserojê ve girêdide. Dengbêjê Kurd, Evdalê Zeynikê dibe dengê dil, dengê evînê, kilam û stranê wî dikarin birînê me bidin kewandin û evînê me bidin jiyandin.



Berga pirtûka 'Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê' ya bi Erebi

Nivîsîna herdu romanen; Bîra Qederê" û "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" zorê dide me da ku em bibêjin; Mehmed Uzun hem hîmdarê romana kurdî ye û hem jî hevalbendê Ehmedê Xanî, Tolstoj, Dîcken, Balzac, Joyce û Hemîngwayî ye. Ew nivîskarekî dogmatîk nîn e, divê em wî wek nivîskarekî Kurd û navneteweyî dibînin. Uzun hay ji edebiyata cîhanê heye...

"Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" romaneke destanî û folklorîk e, lê şopêñ din tê de hene ji bo nimûnê; sembolîzm. Tişte herî balkêş di Evdalê Zeynikê de ev e, yek jê qulingê baskşikeşti, bêçare, weke neteweyê Kurd kesertişti li derûdora wî, quling azad difirin û ew bi hesret li refen wan dinêhêre, hêz dide xwe, lê nikare bifire. Ew qulingê baskşikeşti neteweyê Kurd bi xwe ye. Ew ji aliye cîranen xwe ve hatiye hêşandin, birîndarkirin. Ev tragedî û dramatîka han romanê bi xwîn û goşt dike, ramanen hêja û nûh dixe nav xwendevanan. Demeke dûr û dirêj quling li ber xwe dide, paşê difire, çavêñ Evdalê kor vedibin, ew dibîne, dew û dewraneke nûh dest pê dike. Bi van bûyeran, roman diqede. Di vî warî de nivîskarî wisan nivîsiye: "Dengê Evdal her kesî mat û sersem kiribû. Evdal, niha stran qulipandin ser ronahiya tavê û

roniya çavan. Ronahiyê zora reşahiyê biribû. Hingê Gulê û doralî famh kîrin ka ci diqewimîye Gulê da tilîlî û çepikan. Hingê heval û dost li Evdal civiyan û ew hembêz kîrin. Hingê Evdal got:

"Ronahî ye, xweş ronahî ye. Ji ronahiyê xweştir tiştekî nîn e. Gelî hevalan.... bi dinê û allemê bigihînine, ronahiyê zora tariyê biriye û şewqê reşshîya şevan bi şûnde xistiye. Lî belê hê tiştine hebûn... Ecêba giran, bi tenê, bi ronahiyâ rojê û bi vebûna çavê Evdal nediqediya. Quling jî dest pê kiribû û xwe dilivand. Wî pihêt, pir pihêt, dida bask û perwazanan... Gulê û heval hê bi Evdal re dipeyvin, ji nişkeke ve, tiştekî din qewimî; quling dest bi firînê kir... Disan em dibînin, di rûpelên dawiyê de bûyerên herî mezin diqewimin ên ku vê romanê bixwînin, dê li ser baskê vê romanê siwar bibin û berê xwe bidin çiyayê Sîpan ê Xelatê.

Dema Uzun dide xuyakîrin ku Kurd ji stran û kilaman hez dikin rastiyê dide ber çavên xwendevanan, dibêje Kurd ev in. Carna Uzun bedbîn e, dibêje: "Nezanî û cahîlliye em dîl girtine, şerê birakuji û ezbeniyê em kirine xezan û belengazân pêncperan. Em Kurd li hev hatine xezebê; birazî li apan, xwazî li xalan, bira li biran, cîran li cîranan..."

Di dawiya romanê de, tarî û nexweşî şûna xwe dide dema ronahiyê; qîreqîr, girî û janêngiran û xemgînî şûna xwe dide ken û şahiyân.

*H*eger peyva romana destanî rast û durist be, ez dikarim bibêjim" Rojekê ji Rojê Evdalê Zeynikê" romaneke destanî ye. Di warê folklorê de nivîskarî wisan nivîsiye: "

Hey li min felekê,

Te çima li min wisan kir?

Te teyrê xwe berda, koma refê min belav kir, Te ez kirim qutikî polê, dev û lêvan wî şima kir,

Herçî dost bû, te li min melûl kir, Herçî dijmin bû, te li min şâ h kir, Hey li min felekê,

Zozanê Sîpanê Xelatê xweş, li siya darê,

Felekê ez şas kirime, berdaye, geh li jorê, geh li xwarê,

Felek xayîn e, dewran bêbext e, dikime-nakime, qet nayê li karî.

Hey li min felekê".

*R*omana Evdalê Zeynikê, mîna dengbêjekî Kurd û figurekî mîtolojîk sala 1900î dihê bîrame, wê demê li ber çavan radixe. Çawan ku di romanê de jî diyar e, Evdalê Zeynikê bav û bapîrê dengbêj û çîrokbehêjîn Kurdan e. Hîkariya wî li ser stran, kilam, helbest û wêjeya devkî heye. Mehmed Uzun ji nûh ve dengbêjiya Evdalê Zeynikê, kilam, ziman û hunera wî aktuelîze dike. Hin kes dibêjin; Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê Oto-boyografiya Evdalê Zeynikê ye; lê ne otoboyografiya wî ye, tenê şubandinekê wêjeyî ya kevn e. Yanê Evdalê Uzunî Evdalekî din e, Evdalekî çêkirî, têne bi kilam û stranê Evdalê Zeynikêve hatiye xurtkîrin û honandin. Bi gotineke din, lehengê romanê hatiye çêkirin. Dîrok ne roman, lê romanê dîrokî hene, di rûpelên pirtûkîn dîrokî de, bûyerên normal diqewimin, lê divê romanê de, em dikarin bûyer û qewimandinê mezintir bixwînin ên ku wêjenas in, dikarin bibêjin; ev roman e, romana giran a ku mîjîye xwendevanan diçeliqîne û xwe berdide nav xwîn û hestiyêwan... Tiştên ku vê romanê, ji kurteçîrokê vediqetin, ev in:

1. Di vê romanê de hêmana bingehîn leheng, Evdalê Uzunî.
2. Qewimandin û bûyer li derûdora Evdalê Uzunî...
3. Derketina kesan li gorî bûyeran, karêñ xwedihînin cîh.
4. Lehengê romanê yê duhemîn û sêhemîn heta cîhekî bi lehengê yekemîn re, paşê cîhê xwe didin kesen din. Bi gotineke din, di romanê de sê tiş giring in, ew ev in: Leheng, cîh û bûyer. Ev hersê di romana Uzunî de diyar in.

Di kurteçîrokê de bûyer giring e, kes li dora bûyeran digerin...

Hin kes jî dibêjin" Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê" destane, lê ne destan e jî, tenê bi zimanê destanê hatiye nivîsin. Destana kurdî avahiyeke civata Kurdan e, lê romana kurdî ji aliyê romannivîsekî Kurd ve dihê nivîsin. Bi gotineke din, roman bi hîzir, zanîn û pênuşa kesekî ava dibe, lê destan malê hemûyan e, malê mîlyonan e, malê hemû Kurdan e. Di romana" Rojek ji Rojê Evdalê Zeynikê" de, tema û celebên şeweyê ve-gotinê hene, bi gotineke din, xwediyê romanê Uzun bixwe ye, lê xwediyê destanê gel e. Bi bîrûbaweriyyê min;"Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê" romaneke klasik e û li ser wêjeya devkî û klasik hatiye avakîrin. Bi peyv û gotin pêşîyan ve hatiye xurtkîrin.

Çima? Di vî warî de wisan nivîsiye: " dinya ava ye, herkes bi aqilê xwe têde şâ ye..." Dîsan di derheqa edetên Kurdan de jî wisan nivîsiye: "... ji sê rojan bi şûn de, mîvan jî dibe xwedyî malê û daxwaz û gotina xwe dibêje".

Di derheqa dijminî de jî dibêje: " Nanê Osmaniyan li ser çökén wane, mirov nikare li wan bawer bibe. Çiya dikare here çiya, lê xûyê Osmaniyan jê nabe cuda." Herwisan bi motîfîn destanên kurdî jî hatiye honandin û xemilandin, bo nimûne:

"Xelkê şîret li Xecê kirin û gotin," tu bi ya me bikî, tu dê dev ji Siyabend berdî, tu çareya wî nîn e". Xecê, bi girîn, li wan vegerand, "na, nabe, Rebbê jorîn şahidê min e, dilê min bi Siyabend re ye. Tişte ku hatiye serê min, bila neyê serê gurê çiyan. Dev ji min berdin."

Di warê pesindarî û hunera nivîsinê de tiştekî nûh heye, pesnê cih û waran xweş hatiye honandin û neqîsandin. Evdalê Zeynikê weke bavê dengbêjan e. Ez ji Kurdistanê dûr, li Swêdê dijim, lê ez di deriyê romanê de ketin nav gund û bajaren Kurdistanê, lê geriyam.

Uzun dibêje? Gava Evdal xwe gihad kahniyek ji kahniyên Sîpanê Xelatê û ji ava hênik hinekî vexwar û tîka dilê xwe şikand, hingê wî bîskekê bîh-na xwe da û paşê destê xwe bir ber guhê xwe û dîsan, lê îcar ji çiyayê Sîpanê Xelatê, deng da. De warê, warê, sed carî warê, Biraqedâ bêye te dînyayê, Zeman xayîn e, bi min re nayê, Ez Evdalê im, Evdalê Zeynikê me, Aşik û serwerê kîfî me, Gulek li rûyê dinê me, Lî iro li ser firara malê me..."

Em dikarin bibêjin ku romana mîna "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" bi naverok û teknîka xwe ve, romaneke destanî ye. Dema ku Uzun pesnê Sîpanê Xelatê dide, dilê mirovî hênik dike, dengê Evdalê Zeynikê bêdengiya dinê dixemiland û hawirdorê xirab nekir, sakîn û xweş dikir, dibêje.

Di vî warî de wisan nivîsiye; " Tava rojê hê xwe nedabû xuyan. Lî ji dûr ve, şewqa çend tîrêjîn tavê xwe diqulipandin ser serê çiyayê Sîpanê Xelatê û dibiriqîn. Belê, li wê derê Sîpanê Xelatê

hebû, çiyayê dostê ewr û ezmanan, serî bi mij û dûman, warê dilketî û evîndaran, şêr û pilingan, stariya keserkûr û bextreşan....

Zimanê Romanê

Zimanê Uzunî, zimanekî zelal, şêrîn, mîna lehiyekî diherike, xwe ber dide kûrahiyên dilan. Dengbêj, kilambêj, kulgûj û hwd zimanê me dewlemend dikin, bîrînên me didin kew-andin û derdên me derman dikin. Ew geleki karên hêja yê civakî dihînin cih; hebûnên çandî û wêjeyî dîcivînin ser hev û di navbera dem û dewranen rabirdû û pêşerojê de pirekî ji pola ava dikin. Yanî zimanê me bi me didin xwendin û şevê tarî bi me didin ronahî kirin. Evdalê Zeynikê, ne tenê dengbêj e; ew wisan jî derdbêj, dilbêj, kulgûj, kurdbêj, êşbêj, serxwebûnbêj û netewebêj e jî.

Zimanê "Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê"; zimanê dengbêjî û stranbêjiyê ye, lê yê "Bîra Qederê" zimanê rewşenbiriyê ye. Ji xwe lehengê Bîra Qederê

"rewşenbîrekî Kurd ê sereke ye. Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" bi zimanê xelqê hatiye nivîsin. Ew, peyv û gotinên kevn aktualîze dike û dihîne bîra mirovî. Gotin û hevokên folklorîk û berê çêkirî dihîne rojêvê, hevokên nûh dirêşîne, biwêjîn kurdî û gotinên pêşîyan ji mirinê rizgar dike, pêywen- diya edebiyata devkî bi ya nivîskî re girê dide.

Heger ji dengbêj, çîrokbehêj, kulgûj, stranbêj û kilambêjîn me nebûna, zimanê kurdî tune bû; neteweyê Kurd jî tune bû, wan dewlemendiya zimanî û zaravayê wî parastine. Gava min romanê xwend, ez gîhistim vê baweriye; Uzun dikare bi zimanê kurdî, romana herî modern binivîsîne, Îmkanên wî hene; rîziman û qayideyîn rastnivîsînê dizane.

Heta nivîsîna romaneke, mîna Evdalê Zeynikê, zimanekî her-ikbar dixwaze, zimanekî dengbêjî, nerm, şêrîn û zimanê gundiyan yê ku xwe parastiye...

Bi rastî, zimanê Mehmed Uzunî; bîhn, tahm, lezet û rengîn dewlemendiya zimanê kurdî diyar dike û wî dide ber zimanên îngilîsî, fransî, swêdî, farisî, erebî ...

GIRINGIYA KURTE - ÇIROKÊ Û PÊVAJOYA WÊ YA CÎHANÎ

- 1 -

Dr. Pêşrew Berwari
Lozan - Siwîsre

Nivîskarê Firansî Standal gotiye : "Roman awêne û di kolanan de digere... Lê li vir em dixwazin bê dudîlî bêjin, ku çirok xuška romanê û helbestê û şanoyê ya dilsoz e..."

Berî em têkevin hindir mijara xwe ya sereke, di baweriya me de, divê em gavên xwe zor bi kurtî biçend pileyên zanistî bavêjin, şimkî ev pêngava pêwîstîyeke akademîkî ye û pêwendiyêni xwe ne raste rast (ne yekser) bi mijara me re hene û her weha jî, ew dîbin bingehêk objektîf ji lêgerîna me re:

- 1 - Giringiya çirokê û rola wê di jînê de
- 2 - Destpêka avakirina çirokê û pêşketina wê di dîrokê de
- 3 - Dîroka pêşvebirina çiroka Kurdî ta derçûna kovara Çiya.

1 - Giringiya çirokê û rola wê di jînê de

Rexnevanê Rûs yê navdar B. G. Belînskî nîrîna me li ser çirokê, ya me li jor nîşankiribû, bi çend gotinên jérîn diçespîne û dibêje : "...Gelek bûyer û nişkav hene nikarin li gor sirûşt û xweserên xwe, riwestên dirama pêkbînin û her wisa jî, ji romanen re jî, bê sûd û kérin, lê van bûyer û nişkavan tamarên xwe di jînê de kûr berdane. Pir caran, jîn di kurte demekê de diyar dibe, sedsalek nikare van diyardeyan di nav xwe de bicivîne, lê çirok dişe van bûyeran hembêz ke û di çarçeveke teng de bicivîne, jî ber ku çirok, bi dîdem û çembera xwe ve, dikare her tiştekî dijînê de hembêzke...."

Bi rastî, kardaya çirokê kurt ne hêsanî, zor caran roman neşin rola wê bilîzin. Maupassant dibêje : "Hin kat hene bi lez diborin, belkî linik mirovokî normal, ev kat bê nirx be, lê bi rastî, dibe ew kat bi xwe jî pir bi wate bin..."

Li gor van encamên jorîn, bawerîyên mirov bi çirokê her xurtir dibe û ew cihekî bilind di rex cureyên wêje de distîne û bi ya me be, nirxbihaya wê, ne ji roman û şano û ji cureyên din, ji tote kêmîtir e, ew jî, bi xûşk û birayên xwe re li kolanan digere û wêneyan di dilê xwe de nîgar dike, yanê her yek ji vancelebêne tote yê roleke xwe taybetî heye û yek dewsa ya din nagre, lê hemî bi hev re bi kardeyeke gelempêri radîbin û dikevin xizmeta civaka mirovayetiyê.

2 - Destpêka avakirina çirokê û pêşketina wê di dîrokê de:

Li roavayê mêtûya wêjeyê, gelek berxwedan di warê nivîsandina çirokê de dîtine. Di sedsalên çardan de, li bajarê (Roma) berxwedanekê di rojîn qesrê (Fatikan) de destpêkir, ew roja bi navê (kargeha derewan) hatibû naskirin.

Heroj êvarê, çend sikreterên (Baba) û bi hawrêyên xwe ve (li kargeha derewan) besdar bibûn, di wir de, nûçe û pir tiştên bi ken û sêr, li ser mêt û jînîn İtalya û her weha li ser (Baba) bi xwe jî, ji hevre digitin, lewre pir kes li vê (kargeha derewan) amade dibûn, ta ku, tu kes li ser wan jî, vir û fortan nekin.

LABÎRENTA EDEBÎ



Senar Şahîn

Edebiyat gelek girîng e. Xwendina berhemên edebî pirr xweş e. Edebiyat jî wek labîrentê ye, çawan ku mirov bikeve nav labîrentê û hendî nikarê derkeve, edebiyat jî wûsane ku mirov gava bikeve nav hendî jê nikare derkeve. Di esasê xwe de piştê ku mirov ket nav, ji xwe hendî hewce nake ku mirov ji nav derkeve. Edebiyat wek bexçeyê "aden"ê ye, hemû tewir dar û fêkî, gul û çîçek tê de heye. Ma mirov çawan qîma xwe dike ku ji nav wan gul û nêrgizan derkeve. Hestê mirov bi wan gul û fêkiyan xweşhal dibe, mirov bi wan bextiyar dibe.

Edebiyata Kurdî a devkî pirr dewlemend e, ya nivîskî jî ber bi dewlemendiyê ve diçe. Di van çend salên dawîn de gelek berhemên edebî yêñ hêja li deriveyî welêt - xaseten jî li Swêdê- hatin weşandinê. Pirtûka bi navê "Labîrenta Cinan" jî ji wan berheman yek e. Ev cara duyem e ku ez vê pirtûkê dixwînim. Her çiqas nivîskarê pirtûkê Hesenê Metê wê wek roman bi nav nekiriye jî, ev pirtûk 24 ayar roman e, bi her awayî berhemek edebî ye. Labîrenta edebiyatê di vê berhemê de heye. Berhem gulek ji baxê fremê ye. Realîteya civaka Kurd, rastiya gundiyanê Kurdistanê, qarek-tera mîrên Kurd di vê pirtûkê de heye. Ez dê li ser van tiştan bi kurtahî hinek bisekinim.

Qehremanê romanê mamoste Kevanot e. (Nivîskar vê navê ecêp ji ko diye mirov şas dimîne.) Ew jî bo ku di wî gundî -ku mamostekî berê jî wî gundî re dibêje "Gundê dînan" di dibistanê de ders bide, tayina wî derdikeve wî gundî. Wexta ew û xanima xwe Nêrgiz diçin gund, di rêde, ew hawakî balkêş bi xanima xwe re diaxife. Nivîskar jina mamoste Kevanot Nêrgizê, gund û gundiyan, 16 mal û malbatên gund bi şêweyek gelek baş bi xwendevanan dide danasîn. Lê mamoste Kevanot nadî danasîn. Di derbarê wî de, di derxeqê xwî û qareqterê wî de agahdarî tune. Diyar nîne ku bi rastî jî Kevanot bi xwe mirovek çawan e. Têt fêmkirin ku mamoste Kevanot mirovek baş e, xêrxwaz e. Bi keçika ku mar pê ve daye re alîkarî dike. Lê dîtin û ramanên mamoste ci ne? Ne diyar e. Gelo ew welatparezekî Kurd e, yan mirovekî normal ji xelqê ye? Gelo siyasî ye, yan ne siyasî ye?

Bavê Gebran cara duyem dizewice. Di nav Kurdan de du car zewicandin gelek çêdibe. Bavê Gebran bi keçikek piçük re dizewice. Ev jî di nav Kurdan de dibe. Ji pirraniya mîrên Kurdan ji jînên xwe mezintir in, bi emirtir in. Di nav gel de idiyomek heye dibêjin; Kurd wexta dewlemend bibin yan dizewicin yan jî mîr dikujin.

"Ew jî doxînsistikî miriyê jinan e!" Ev jî rast e. Kurd doxînsist in. Eqilê Kurdan tim li ser penîsê wan e.

Gebrann ji mameste Kevanot re dibêje: "... bifi-kire ku di vî gundî de, ne tenê bavê min û ne tenê apê min... gişt... yek ji yekê xirabtir e. A piştî çend mehê din tu ê bi xwe jî bibînî bê çi ehmeq, saxik, kêmaqil û rengdîn..." di wî gundî de hene.

"Ehmeq, saxik, kêmaqil û rengdîn" di nav her cîvakê de hene. Lê di nav Kurdan de hîn pîrrir e. Kêmaqilî û ehmeqîya hinek Kurdan bûye bîlayê serê wan. Cehşîtî û xaîntiya hinek Kurdan mala Kurdan şewitandiye.

"Kûpo î mezinê malê daxwazeke din ji Çavbeloq dike û pê dide zanîn ku ew bi jîna birayê xwe î rihmetî re bizewuce." Ev tişt jî di nav Kurdan de pîrr hatiye kîrin. Gelek jîn ku mîrê wan dimirin yan têne kuştin, bi birayê mîrê xwe re dizewicin.

Baweriya bi motîfa cinan jî di nav gelê Kurd de heye. Kurd û bi taybetî jî gundiyyen Kurdan bi hebûna cinan bawer dikin. Ji xwe li gor dînê İslâmî jî cin hene.

Di rûpela 65'an de nivîskar dîrek bi xwendevanan re dikeve diyalogê û 16 malên gund bi xwendevanan dide danaşîn. Nivîskar van 16 malan bi devê Gebran bidana qalkîrin hîn baş bû. Yanî Gebranê ku ji wî gundiye û hemû gundiyyen yek bi yek ji piçûkîn wan hetanî mezinan nas dike, wê 16 malên gund ji mamestere qal bikirana metodek hîn baştır dibû.

Nivîskar di vê pirtûkê de hin kelîme bi kar anîye ku gelek kes bi maneya wan kelîmeyan nizanîn. Ji qalkîrinê -behskîrinê re "çêli" gotiye. Ji nezerê re "çavînokî" gotiye, û hwd. Di şûna metbexê de jî peyva "aşxane" bi kar anîye. Aşxane û metbex ne eyne tişt in. Di gel van tiştan, wek din zimanê nivîskar gelek baş e, zimanek edebî ye.

Di salêن 70'yî de hinek nivîskarêن Tirk bi navê "Köy Romant -Romana Gund" gelek roman nivîsin. Ji romana Hesenê Metê "Labîrenta Cinan" re jî mirov dikare bibêje ku ev "Koy romani, anku romana gund" e.

Ev pirtûka Hesenê Metê di nav weşanê "Welat" de derketiye. Weşanxaneya Welat gelek pirtûkê hêja weşand e. Lê çi heyf ku ev weşanxane niha rawestiyaye, hendî tu pirtûk naweşîne.

Weşanxaneya Welat gelek berhemên klasîk ya edebiyata cîhanê wergerand Kurdi û weşand. Em li jêr navê hemû pirtûkê ku ji alî weşanxaneya Welat ve hatiye weşandin, diweşînin. Yênu ku bixwazin van pirtûkan bikirin dikarin ji navnîşana kovara Helwestê van pirtûkan bixwazin. Pirtûk bi %30 erzanî ye.

Pirtûkê Weşanê Welat

- 1 - Ardû - Hesenê Metê - Çîrokên Gelêrî
- 2 - Smîrnoff - Hesenê Metê - Novel
- 3 - Labîrenta Cinan - Hesenê Metê - Roman
- 4 - Rojek Ji Rojêv Evdalê Zeynikê - Mehmed Uzun -
- 5 - Mirina Egîdekî - Mehmed Uzun - Destan
- 6 - Tilûrê Bêgane - Redwanê Alî - Novel
- 7 - Mehkûm - M. Alî Kut - Novel
- 8 - Hatıralarım - Musa Anter - Bîranîn
- 9 - Siwarêñ Eşê - Fawaz Huseyîn - Novel

Yen Wergerê :

- 10 - Keça Kapitan - Puşkin - Roman
- 11 - Mirina Karmend - Çexov - Kurteçîrok
- 12 - Merivêñ Reben - Dostoyevskî - Roman

Berhemâ HESENÊ METÊ ya nûh
EPÎLOG
Derdikeve!

ÎPEK / HEVRÎŞIM

K. HELWEST

Romana nivîskarê Îtalî Alessandro Barîcco "Îpek - Hevrîşim" romanek gelek xwes e. Ev roman romana lêgerîna bextiyariyê ye. Ev roman wexta ku di Îtalyayê de hate weşandinê, di nav sal û nîv de 250 hezar hate firotinê. Romana bi navê "Hevrîşim" bi 17 zimanân hatiye wergerandin û weşandinê. Li tirkîyê jî bi tirkî di nav weşanên CAN de hate weşandinê.

Bûyera romanê di sala 1861'an de li başûrê Fransayê derbas dibe. Herve Joncour bi jina xwe re jiyanek bextewarî didomîne. Ew bi çandiniya Hevrîşim debara xwe diburînin. Ji kurmê Hevrîsiman Hevrîşim çedikin û difroşin. Di demekî de nexwesi dikeve nav kurman. Herve Joncour ji bo ku kurmê Hevrîsiman yên baş bikire diçe Japonyayê.

Herve Joncour diçe Japonyayê. Li wir keçikek pîr xwesik û delal dibîne. Ew û keçik zimanên hevûdu nizanîn, lê bi çavan, bi meymikên rûyên wan di nav wan de dilgermiyek dest pê dike. Romana Hevrîşim romanek evînî ye. Bi metoda çîrok qalkirina klasîk hatiye nivîsin.

Herve Joncour bi cazîbeya erotîk ya keçikê mest dike. Herve kurmê Hevrîşim dikire û vedigere tê welatê xwe. Di wê demê de ji bo ku firok tunebûn di sê, çar mehan de ancax mirov dikaribû biçe Japonyayê û vegere. Hevre cara duyem dîsa diçe Japonyayê. Keçikê dibîne. Keçik vê carê kaxizek dinivise û di pê. Hevre dîsa vedigerê Fransayê. Ew kaxiz pê re ye. Hevre demek paşê kaxiz dibe bi yekê ku dikare bi Japonî bixwîne dide xwendin. Di kaxiz de tenê ev gotin heye: "Veger were, heger tu neyî ez dê bimirim."

Hevre Joncour cara sêyem diçe Japonyayê. Vê carê demekî dirêj li wir dimîne. Şevez keçik tê û dikeve nav livînê wî. Ew herdu hetanî serê sibê bi hev re eşq dikan. Hevre di jiyanâ xwe de şevez ewqas xwes û bi tehm derbas nekiriye. Keçik bi her awayî wî mest dike. Ew şev ew herdu jî li hev şâ dîbin.

Hevre Joncour dîsa vedigere tê welatê xwe. Bi şev bi jina xwe re eşq dike. Her wekî ku ew bi wê keçikê re eşq dike, hemû hunera ku di dema eşqê de bi keçika spehî re kiribû, bi jina xwe re jî dike. Jina wî mest dibe û ji eşqan, ji dîlsahiyê hêstirên şabûniyê dirijîne. Hevre Joncour şaş dibe, ji jina xwe dipirse; gelo ji bo ci digirî. Jina wî jî dibêje: " ji ber şabûniyê, te ez şad kirim işev, loma ez digirîm."

Jina Hevre Joncour ji bo ku wî şad bike ci ji destê wê tê dike. Lî heş û eqilê Hevre li ser keçika li Japonyayê ye. Di wê demê de di Japonyayê de şerê navxweyî dest pê dike. Gundiyên Japonyayê li dij sazumanê serîhildidin. Serîhildanek gelek mezin pêk tê. Hevre Joncour dixwaze biçe Japonyayê. Her çiqas yên derûdora wî, yên nas û dosten wî jê re dibêjin li wir şer heye, meçe, lê dîsa jî ew lê dixe diçe Japonyayê.

Hevre Joncour li Japonyayê gelek tişt dibîne. Gund û bajarê xirabe, wêrankirî, şerekî bê eman, serîhildana gel dibîne. Li jinika berdila xwe digere, paşê wê dibîne. Keçik jî besdarê serîhildanê bûye.

PÊŞENGAHA PIRTÜKÊN KURDÎ YA DUYEM VEBÛ



Weşanxaneyê Kurdan yên li Swêdê di sala 1996'an de "Pêşengaha Pirtûkên Kurdî Ya Yekem" vekirin. ïsal -1997- jî ya duyem vekirin. Weşanxaneyê Kurdan biryar girtine ku vekirina pêşengahê bikin wek tradisîon û her sal wek adetî di meka 12'an de-di meha Kanûnê de- vebikin. Pêşengehê par li xaniyê ABF'ê, ïsal jî li Alvîk'ê vekirin.



Sala parîn weşanxaneyê Kurdan yên ku besdarê pêşengahê bûbûn hindik bûn, ïsal pir bûn. Weşanxaneyê ku besdarê pêşengehê bûn ev in:

Apec, Çanda Nûjen (Helwest), Deng, Diljen, Jîna Nû, Kitab-î Erzan, Weşanên Welat, Kawa (weşanxaneyâ Kurdên başûrê biçûk e), Kulturföreningen SV-Kurdistan, Medya, Mezopotamya, Nûdem, Pencînar, Roja Nû, Sol - Förlag, Svartvitt (Ev herdu weşanxane navêwan bi Swêdîne, lê weşanxaneyê Kurdan in.)

Di pêşengehê pirtûkên Kurdî de her çiqas pirtûk kêm bêne firotin jî, ev çalakî bi her awayî girîng e, û divê bê domkirin. Li gor salaçûyî, ïsal baş bû. Întresa gel hebû. Gelek mirov hatin ú pêşengehê geriyan, gelek pirtûk kirîn. Weşanxaneyê Kurdan ïsal ji par pirtir pirtûk firotin. Pirtûkên ku li ser maseyan hatibû raxistin ji yên par pirtir bû. Xuya bu ku weşanxaneyê Kurdan di sala 1997'an de gelek pirtûkên nûh weşandine.



Bi hêviya ku ev tradision dom bike û li Stockholmê hersal pêşengaha pirtûkên Kurdî di meha 12'an de bê vekirin.

Pirtûkên Nû

XWENDINA KURDÎ

Dr. Kamiran Ali Bedir-Xan

JIYANA CELADET BEDIR-XAN

Konê Reş

EY ŞEHÎD, HEY HEBÛN

Lokman Polat

Weyla Licê, Weyla Licê

DÎROKA BÎRANÎNA ŞEHÎDAN

Dilpêt Jêlî

ÊŞA HADEPÊ JANA AMEDÊ

Seracettîn Kirici

Bixwînin! Bidin Xwendin!

Têbinî: Hûn pirtûkên li jor dikarin ji navnişana
kovara Helwest'ê bixwazin

Navnişana Xwestinê : Tensta Alle 43 - 2tr.

16364 SPÅNGA - SWEDEN

HELWEST


Kovara Kulturî û Lîteraturî

Hejmar / No: 9 — Sal / Year - Zivistan - 1998

SERPÊHATIYÊN JINÊN KURD

J
I
N

Û
Zîndan



Z
Î
N
D
A
N

JIN

Û

ZÎNDAN

Lokman Polat

Derket !

Bixwînin! Bidin Xwendin

Weşanên Çanda Nûjen

Helwest = ISSN - 1400 - 9404